

# Li Sûriyeyê şovenîzma erebî

Berpirsayarê Perwerdehiyê yê bajarê Hesîça rojavayê Kurdistanê giştîname ji mamosteyan re şand. Di giştînameyê de tê xwestin ku zimanê erebî bê parastin û 'qirêjiya' zimanên din negihîje erebî

**Di giştînameya ku ji mamosteyan re hatiye şandin de tê gotin bila 'qirêjiya' zimanên din negihîje erebî. Di giştînameyê de ji bo zimanê kurdî peyva 'qirêj' tê bikaranîn û li hemberî kurdî êrîşeke faşîzane û kirêt tê kirin. Li Sûriyeyê zimanê kurdî qedexe ye. Her wiha bi sed hezaran kurdên li vir dijîn bê nasname ne, mamoste û xwendekarên kurd jî di bin zextên dijwar ên rejîma Sûriyeyê de dijîn...** *RÛPEL - 6*

## Pişaftineke mezin li ser kurdî heye

Cejna Zimanê Kurdî bi çalakiyên cur bi cur têne lidarxistin. Di panela li Amedê de mamosteyê zimanê kurdî Suleyman Yilmaz diyar kir ku ji 1925'an heta niha ji bo pişaftina kurdî bi awayekî bi rêk û pêk polîtîka hatine meşandin. Nivîskar Amed Tîgrîs got kurdî bi asîmîlasyoneke mezin re rû bi rû ye... *RÛPEL - 6*


# Hawar

Rojnameya Rojane

19 Gulan 2009
Sêşem
Sal: 1
Hejmar: 14
Buha: 50 Kr




## Li Wanê çadira kurdî

Çadira Ziman a bi boneya Cejna Zimanê Kurdî hatî vekirin, rastî eleqeyeke mezin tê. Li çadirê 5 hezar pirtûkên aîdî 8 weşanxaneyên kurdî têne pêşandan. Di çadirê de nivîskar Omer Dilsoz pirtûkên xwe îmze kir û rastî eleqeyeke mezin hat... *RÛPEL - 6*

**Juriya 'Kozaya Zêrîn'** **R.6**

# 12 ROJÊN KRÎTÎK

Ji 1'ê hezîranê dawiya 'rewşa bêpevçûn' ya Koma Civakên Kurdistanê re 12 rojên krîtîk man. Di van rojan de gavên bêne avêtin dê rewşa çareseriya pirsgirêka kurd diyar bikin. Serokomar Abdullah Gul vê carê nêrînên xwe yên ji bo çareseriya pirsgirêka kurd ji Şamê ragihand. Rewşenbîr, sendîka û saziyên civakî ji bo pirsgirêka kurd bi riyên demokratîk û diyalogê bê çareserkirin ketin dewreyê

## 'Heta 1'ê hezîranê wek pira siratê ye'

Piştî daxuyaniyên lîderê PKK'ê Abdullah Ocalan û Serokomarê Tirkiyeyê Abdullah Gul, rewşenbîr jî ketin nava tevgerê. Rewşenbîr û nûnerên rêxistinên civaka sîvîl ji bo ku biçin serdana hemû nûnerên partiyên siyasî, dê heyeteke ava bikin. Rewşenbîrên ku lez dane xebatên xwe, dê ji bo pêngavên şênber ên ji bo çareseriyê ji rêveberiyên partiyên siyasî daxwaz bikin. Her wiha rewşenbîran rojên heta 1'ê hezîranê weke pira siratê bi nav kirin... *RÛPEL- 4*



* Guherîna makeqanûnê

## GUL VÊ CARÊ JI ŞAMÊ VEGOT

Serokomarê Dewleta Tirk Abdullah Gul piştî serdanên xwe yên ji bo Tehran û Bexdayê dawiya hefteyê li Şamê bû. Gul li Şamê peyamên ji bo çareseriya pirsgirêka kurd dan û anî ziman ku pirsgirêkên Tirkiyeyê dê bi riya demokrasiyê bêne çareserkirin. Lê dîsa jî nexşeriyeke ji bo çareseriyê bi lêv nekir. Gul, nêrîna xwe ya ji bo çareseriyê dubare kir.

## NÊRÎNA HEVPAR A DEWLETÊ YE

Gul li Şamê bersiv da rexneyên Serokê Giştî yê MHP'ê Devlet Bahçelî û Serokê Giştî yê CHP'ê Denîz Baykal û got: "Dest ji hamasetê berdin û ji bo çareseriyê piştgiriyê bidin." Gul anî ziman ku ew ji bo çareseriyê xweşbîn e û wiha dirêjî da gotinên xwe: "Gotina min a ji bo 'fersenda dîrokî' nêrîna dewletê ya hevpar e."... *RÛPEL - 4*



## Şehîdên Gulanê hatin bibîranîn

14 saziyên sivîl û civakî yên wekî Hewildana 78'yiyan, EMEP, ODP, DTP, ESP, SDP, Partiya Sosyalîst, EHP û rêxistinên elewiyan pêk dihat, ji bo Îbrahîm Kaypakkaya, Ferhat Kurtay, Eşref Anyik, Necmî Onen, Mahmût Zengîn û Hakki Karer bernameya bîranînê li dar xist. Rêveberê Hewldana 78'yiyan Adil Boyoglû li ser navê saziyan daxuyanî xwend û wiha got: "Divê em agirê Ferhatan geş bikin û wan bi hurmet bi bîr bînin. Divê em Hakî Karerê hate kuştin jî ji bîr nekin û îxanetê lanet bikin. Ji bo der barê kuştina Kaypakkaya de dîsa lêpirsîn bê vekirin em piştgiriyê dixwazin. Divê kuştina Kaypakkaya zelal bibe."



## 5 hezar kes tevlî şahiyê bûn

Di şahiya DTP'a Silopiyê de 5 hezar kes hatin cem hev. Di şahiya li herêma Alî Hams de zordariyên li ser zimanê kurdî hatin şermezarkirin. Rêveberê DTP'ê yê Navenda Giştî Mahsûm Kunur derbirî ku şahiya li dar dixin şahiya têkoşînê ye û bal kişand pekutiyên li ser kurdî. Serokê DTP'a Silopiyê Suleyman Şavluk jî xwest pekutiyên li ser kurdî bi dawî bibin. Şaredarê Silopiyê Emîn Tourlu jî Cejna Zimanê Kurdî pîroz kir û derbirî ku heta dawî dê têbikoşin.

## Zarokên Mexmûrê karne girtin

Li Wargeha Penaberan a Mexmûrê dibistanên seretayî Dibistana Mehmet Karasungur, Dibistana Şehîd Salih Kendal, Dibistana Dr. Nurî Dersimî, Dibistana Navîn a Şehîd Jiyan û Dibistana Amadeyî ya Şehîd Koçerîn ketin betlaneya salê. Bi hezaran xwendekar bi coş û heyecaneke mezin beşdarî merasîma betlaneyê bûn. Ji bo betlaneya salê duh li wargehê merasîmek hate lidarxistin. Piştî merasîmê xelatên xwendekarên di refên xwe de bûne yekemîn û teqdîr û spasname girtin, hatin dayîn. Piştî wê di refan de karneyên xwendekaran hatin dayîn. Hin xwendekar kêfxweş, hin xwendekar jî bi boneya dersên wan nebaş bûn bi xemgînî karneyên xwe girtin.



## Dadgeha alman qedexeya li ser Roj TV rakir

Dadgeha Îdarî ya Almanyaya Federal qedexeya li ser Roj TV ya ji aliyê Wezareta Hundirîn ve hatibû dayîn da sekinandin. Dadgeha li Leîpzîgê du daxwaznameyên gilîkirinê yên ji bo qedexeya li ser Roj TV'ê bê rakirin, qebûl kir. Dadgehê di biryara xwe de ji ber ku li hemberî qedexeyê doz hatiye vekirin, biryara ji bo sekinandina qedexeya li ser Roj TV da. Dîroka destpêkirina dozê nehate diyarkirin. Qedexeya li ser Roj TV'ê li ser hewldanên dewleta tirk ji aliyê dewleta alman ve hatibû dayîn. Li hemberî vê biryara qedexekirinê gelê kurd li hemû deverên lê dijîn çalakiyên protestoyî li dar xistibûn.

## Wekîlê Serokê Koma D… pirsgirêka kurd de girîn… yên der barê pirsgirêka… bernameyeke sîstematîk… her wiha ji bo îfade dayî…

hattîn Demîrtaş got ku gotinên Gul ên der barê pirsgirêka kurd de girîng dibînin. Demîrtaş wiha got: "Sekna Serokomar Gul û ramanên wî yên der barê pirsgirêka kurd de ne gotinên ku hema hatine gotin in. Nîşan dide ku proje û bernameyeke sîstematîk heye. Em nizanin çi ne. Lê hewldanên erênî û girîng in." Demîrtaş her wiha ji bo îfadedayînê jî wiha got: "Tiştê li hemberî me tê kirin neheqî ye, heqaret e. Em jî dibêjin weke berxikan em ê neçin. Lê weke ku em dixwazin aloziyê derxin didin nîşandan. Ev yek jî neheqî ye."

www.arsivakurdi.org

## Şêwirgeh

Cemal Şerîk

# Yekîtiya têkoşînê

Li Tirkiyeyê meha ku em tê de ne ji bo hemû hêzên demokrasiyê xwedî wateyeke girîng e. Hemû rojên meha gulanê bi nirxên girîng hatine tijekirin. Ji ber vê yekê ye mirov nikare rojek girîng ji nava rojên din hilbijêr e. Roja yekem a meha gulanê, bi qasî kedkarên navneteweyî girîng e, ew qas jî ji bo hêzên demokrasiyê yên Tirkiyeyê jî pir girîng e. Her wiha ji ber li Tirkiyeyê di 1'ê Gulanê de bûyer qewimîne û bedel hatine dayin wateyek girîngtir li wê rojê bar dike.

Tenê bûyera 1'ê Gulana sala 1977'an aliyekî rastiya gulanê dide nîşan. Meha gulanê ji roja xwe ya yekemîn de ji bo hêzên demokrasiyê xwedî wateyeke girîng e. Her wiha rojên xwe yên din jî xwedî heman wate ye û girîngiya wateya xwe diparêze. Rojên 2'ê gulanê, 6'ê gulanê, 13'ê gulanê, 17'ê gulanê, 18'ê gulanê, 19'ê gulanê û 30'ê gulanê di nava van rojên girîng û xwedî wate de cih digre. Ji ber van rojên girîng û xwedî wateye ku meha gulanê ji bo hêzên demokrasiyê wekî 'Meha Şehîdan' tê qebûl kirin.

Di sala 2009'an de bi rengekî din em ketine vê mehê. Di dawiya meha nîsanê û destpêka meha gulanê de şehadeta Orhan Yilmaz Kaya ya li Stenbole di vî warî de ciheki girîng digre. Orhan Yilmaz Kaya, şoreşgerekî Tirkiyeyî bû. Li gel vê yekê beriya ku biçe ser dilovaniya xwe gotibû "Ez dixwazim yekîtiya têkoşîna gelên kurd û tirk ava bikim". Hedefa hêzên demokrasiye yên Tirkiyeyê ya "Avakirina yekîtiya têkoşîna gelên kurd û tirk" ji aliyê Orhan Yilmaz Kaya di roja navbera nîsan û gulanê de hate ziman. Ev yek jî wateya meha gulanê hîn xurtir dike. Ev yek ji bo hêzên demokrasiyê yên Tirkiyeyî jî meha gulanê dike xwedî wateyek girîng. Ev yek meha gulanê ji bo hêzên demokrasiyê yên Tirkiyeyî dike xwedî wateyek enternasyonal.

1'ê gulan di qada navneteweyî de roja kedkar û karkerên cîhanê ye. Ev yek aliyê taybetiya enternasyonal a vê mehê ye. Ji aliyê hêzên demokrasiyê yên Tirkiyeyî de taybetmendiya enternasyonal a meha gulanê, di şexsiyeta rêberên şoreşger de hîn kurtir û watetir bûye.

Di 6'ê gulana sala 1972'an de li Darê darvekirina Deniz Gezmiş bi gotina "Bijî biratiya gelê kurd û tirk" ev rastî di asta herî jor de temsîl kiriye. Piştre kesayetiyên din jî Deniz şopandine. Îbrahîm Kaypakkaya di nava van kesayetiyan de cihê xwe digre. Enternasyonalist Hakkî Karer jî di 18'ê gulana 1977'an de bi gotina "Azadiya gelê kurd, azadiya gelê tirk e" ji bo jiyanê xwe feda kir û nûnertiya lûtkeya kesayetiya enternasyonalist dike.

Di pêvajoya ku me gihiştinê de, karaktera enternasyonalist a hêzên demokrasiyê yên Tirkiyeyî, pêdiviya bi yekîtiya azadiya kurd û hêzên demokratîk re pêwîst kiriye. Heta niha karaktera enternasyonalîst di şexsiyeta kesan de pêk dihat, lê belê roja îro pêdivî bi yekîtiya têkoşîn û rêxistinkirina enternasyonalîst heye. Êdî karakterê têkoşîna di nava jiyanê de, têkiliya enternasyonalîst bêdivî û mecbûriyete bi yekîtiya vîna hevbeş dibîne. Bi taybetî berxwedan û gotinên dawî yên Orhan Yilmaz Kaya a beriya dilovaniyê bangawaziya yekîtiya têkoşînê bû.

Ev rastî ji aliyê serdestên Tirkiyeyê ve jî hatiye dîtin. Ji ber vê rastî û serwextiyê ye ku îsal serdestên Tirkiyeyê wateyek ji her sal cudatir dane meha gulanê. Li ser vê ferasetê nêzî 1 û 6'ê gulanê bûne. Sedema 1'ê Gulan wekî roja betlanê qebûl kirin û di 6'ê gulanê de xistina rojevê şehîdên demokrasiyê Deniz Gezmiş, Yusuf Aslan û Hûseyin Înan vê rastiyê dide xuyakirin.

Serdestên tirk, ji yekîtiya gelê kurd û tirk ditirsin. Dibînin ku dê yekîtiya gelê kurd û tirk dawiyê li serdestiya wan bînin. Ji ber van rastiyan divê gelê kurd û tirk bêtir yekîtiya xwe xurt bikin.

Yekîtiya navbera gelan, deyndarê encama têkoşîna hevbeş û hevpar e. Asta ku Têkoşîna Azadî û Demokrasiya Kurd û hezên demokrasiya Tirkiyeyî gihiştinê çespandina vê yekê ye.

Encama hilbijartina 29'ê Adarê ya hilbijartina herêmî, ne tenê ji bo gelê kurd îlankirina vîna demokratîk e. Di heman demê de ji bo hêzên demokrasiyê yên Tirkiyeyî jî îlankirina vîna demokratîk e. Bidestxistinek demokrasiyê ye.

Ev encama ku derket holê, serdestên tirk tirsandiye û ji bo yekîtiya di navbeta gelê kurd û tirk de xera bikin ketine nava tevgerê. Ji bo yekîtiya navbera gelê kurd û tirk xera bike û yekîtiya hêzên demokrasiyê yên Tirkiyeyî belav bike roja 1'ê Gulan wekî roja betlanê îlan kirine. Naveroka têkoşîna Denîz Gezmiş vala kirine û qaşo li wan xwedî derketine û ew bibîr anîne.

Hêzên serdest ên tirk naveroka wateya van nirxan vala kiriye. Divê li hemberî vê nêzîkatiya serdestên tirk, helwestek rast û di wextê xwe de bê nîşan dan. Ger ku li hemberî vê sekna serdestan helwestek tund neyê nîşandan dê demokrasî zerarê bibîne. Divê tu kes destûrê nede zerardayina demokrasiyê. Di vî warî de avakirina Partiya Siwan ku hevbeşî û yekîtiya hêza demokrasiya tirk û kurd xurt bike girîng e. Meha gulanê ku ji bo şehîdên demokrasiyê xwedî wateyek girîng e û kesayetiyên karaktera enternasyonalist di xwe de vedihewîne ancak bi avakirina Partiya Siwan berambeqiya xwe bibîne.

Em jiyana rojên gulanê ku ji bo Hêzên Demokrasiyê yên Tirkiyeyî wateyek taybet e. Di pêvajoyek wisa ku em rojên meha gulanê dijîn de; Ez di serî de şehîdên 1'ê Gulanê û hemû şehîdên gulanê ên wekî Deniz Gezmiş, Yusuf Aslan, Huseyîn Înan, Sînan Cemgîl, Kadîr Mangay, Alpaslan Ozudogan, Îbrahîm Kaypakkaya, Hakkî Karer, Halîl Çavgûn, Orhan Bakir, Ferhat Kûrtay, Mahmût Zengîn, Eşref Anyik, Necmî Oner, Mehmet Karasûngûr, Îbrahîm Bilgîn û Orhan Yilmaz Kaya careke din bibîrtînin û bejna xwe li hemberî wan ditewînim. Bibîranîn û hurmetdayîn berpirsyariyek têkoşîna demokrasiyê ye.

# Em nabin Çermesor

NÎDAYÎ TEZER

Mêtingerî rasterast desteserkirina nirx, dewlemendî û erdnîgariya gelan e. Bi hêz û amûrên leşkerî û bi dirûvek hovane, hemû sînor û stûnên bingehîn hildiweşîne.

Anatomiya civakan serobinî dike. Ji serê berxwedêran qûçan diafirîne. Ji xwînê rûbaran diherikîne. Bîr û newalan bil aşan dadigre.

Wek newala qesaba, zîlan, laç..

Ma kom bi kom qirnekirin Çermesor?

Ev hêj destpêk e. Merheleya yekemîn e. Mêtingerî di heman demê de xwedî pergal e.

Piştî belawela û komkujiyê îcar vedigere ser rihê aramiyê(!) û "gencineyên xwe" dide ber qilên teşedayînê.

Lewra ego û ajoyên dagirkeriyê çavbirçî ye; qîma xwe tenê bi "serî tawandinê" nayne, divê pêşerojê ji bifikire!

Îcar, ji dêvila eciqandina serê çelîkên mar, ji derziya "jahr" ê dihêlin. Bêpar. Bi vî awayî, êdî xetereya veşartî ji hatiye bertarafkirin!

Ma marê bêyî derziya xwe ya "jahr" ê wê çi xweliyê li serê xwe bike? Ma wê çawa xwe bi biparêze li dijî xwezaya kovî. Mar bi "jahr" ê diaxife, dijî xwe diparêze.

Navê vê rêbazê hanê- bê "jahr" hiştin, ango ziman jêkirin- di ferhenga siyaset û zanyariyê de: ASÎMÎLASYON e!

Asîmîlasyon, xesandina kes-gel- neteweyekî ye. Di malzarokê de fetisandina reseniyê ye. Kuştina ziman esas digire.

Ger ku piştî merheleya duyemîn, xweserî bi çol û beyaran bikeve, motîf û fîstanê xwe bavêje; reng û bêhna kulîlkên îthal sermest bike û kompleksa ji zimanî xwe fedikirin dest pê bike, pê neaxife, pê nenivîsîne, ev jî dibe: OTOASÎMÎLASYON!

Otoasîmîlasyon, ji cureyên xwekuştin ya herî erjeng e!

Qey çermesoran jî qet xwe nekuştin?! Li gorî dogumontera: "înto the west" (berbi rojava ve) bi pejrandina zimanê biyanî- çi bi zordariyê, çi bi dildariyê- qîra xwe anîn.

Aborjîn jî zêde neman ji xwe….

Macirên navenda Asyayê piştî, dagirkirina Kurdistanê ji dawa komarê tovên asîmîlasyonê reşandin, otoasîmîlasyon jî nema ji vê govendê(!)

Hew dayik dengbêj û medreseyan li ber xwe didan. Mala wan ava lê, ew jî ber bi têkçûyinê ve dimeşiyan.

Tevgera azadî gihîşt hawara kurd û Kurdistanê. Vejîna neteweyî pêk anî. Bes di destpêkê de li dijî xetereya asîmîle û atoasîmîleyê zêde tênekoşiya. Lê niha bi hemû hêz û qeweta xwe dest suetiyê ve kêşeye. Roj bi roj enesmên erênî jî dertên holê.

Belê ne bes e, qim nake. Hêj tîraja 'Azadiya Welat' li der dora deh hezarane. Kêm e. Sazî û siyasetmedaran girtiye rojava xwe.

Zarokên bi qad navê pakrewanan bi zimanê qetilhêzan dikevin. Xemsariya girtiyên azadiyê berdewam e.

TZP-Kurdî kampanayaya: "Edî bes e! Em perwerdehiya bi zimanê xwe dixwazin' dayî ye destpêkirin. Gavek pîroz û giranbûhaye.

Dem dewlemendiya bernameyê û konsensusa berfireh, hêvî û kelecan dide. Eger li gorî plansaziyê xebat bêne meşandin, ew ê ji bo pêşketin û vejîna zimanê kurdî bibe pêngavek rewneqdar.

Em ê, nebin Çermesor, aqûbeta aborjînan parve nekin;

Em ê bi liv û bizav; bi pênûs û xwestekek têkûz; bi xwendin û nivîsandinê û bi rengê xwe yê kurdewarî bibin rihustanê asîmîlasyon û otoasîmîlasyonê.!

Em, bi van hest û baweriyan û bi dil û can kampanyaya zimanê kurdî silav dikin.

Serkeftin dixwazin.

# Ji bilî zimanê dayikê her ziman 'Zimanê Biyanî' ye

SERDAR BALCI

*Cihan û jiyan.. her du jî her tim diguherin.*

Jixwe jîrzanê yewnanî Herakleitos wiha dibêje: *"Tiştek heye ku naguhere, ew jî guherîn bi xwe ye."* Metabolîzma divê ku her tiştî hêdî hêdî bijî. Ji ber ku guherînên ji nişka ve rastî bertekan tên. Ev yek di xwezaya hemû jîndaran de heye. Jîndar li ber vê guherînê bi berteka xwe yan bi ser dikevin û yan jî têk diçin.

Gelo kî nava mêjiyê zarokan vedizane? Ka bi destpêkirina dibistanê re tê de çi guherîn çêdibe? Çawa amadekariya van guherînan dike?

Zarok êdî ne bi tenê zarok in, ligel zarokbûna xwe xwendekar in jî û hêdî hêdî bi berpirsyarî dest pê dikin. Waneyên têvel bi spartekên xwe ji bo wan dibin berpirsyarî. Heta vê derê ji bo zarokên Tirk tu pirsgirêk tuneye. Ew jixwe li mala xwe jî Tirk in. Dê û bavên wan hemû helwestên xwe bi wî zimanî nîşan didin. Bi wî zimanî hez dikin, hêrs dibin, dipirsin, dibersivînin û hwd. Bi kurtasî, zarokên xwe bi wî zimanî mezin dikin. Perwerdehiya li dibistanê jî bi zimanê dayika wan e.

Lê em vegerine ser rewşa zarokên ku ne tirk in. Bo mînak: zarokên kurd.

Li hemberî zarokên kurd û zimanê kurdî hemû rêzikên mirovahî, dadî, sincî û vacî hatine binpêkirin. Barê li ser pişta zarokên tirk bi tenê xebata waneyan e. Lê zarokên kurd? Ligel xebata waneyan, hînbûna zimanekî nû ye. Zarokên kurd gava ku diçine dibistanê, zimanê xwe yê dayikê li ber derê polê radiwestînin, dibirin û wisa dikevine hundir. Guherîn hêdî hêdî çênabe. Bi hemû tundî û bêdadiya xwe mîna şeqameke li rûyê wan dikeve. Metabolîzmaya wan serobino dibe û alozîyeke mezin di nava mêjiyê wan de rû dide. Derbeya mezin a dûgelê (dewlet) di pola yekem a dibistana seretayî de li kesatî û vîna wan dikeve. Zarokên kurd li dibistanên tirkperest û tirkîperest jiyaneke kûvî dijîn. Destûr tuneye ku zimanê dayika wan bi wan re bikeve polê. Mirov dikare vê rewşê bişibîne penaberiya kesên biyanî yên li welatekî din. Ew kes li wî welatî bênasname ne û rewşa girantir jî ev e ku, ne kesek ji zimanê wan fêm dike û ne jî rûmetê nîşan dide.



Li hemberî zarokên kurd û zimanê kurdî hemû rêzikên mirovahî, dadî, sincî û vacî hatine binpêkirin. Ligel xebata waneyan, hînbûna zimanekî nû ye. Zarokên kurd gava ku diçine dibistanê, zimanê xwe yê dayikê li ber derê polê radiwestînin




Ne bi tenê ji bo kurdan, mirov dikare bibêje ku ji bo her kesî rastiyeke gerdûnî heye: Ji bilî zimanê dayikê her ziman "Zimanê Biyanî" ye. Lê mixabin Dûgela Tirk di xala 42'a Zagona Bingehîn de ev rastî kud (felç) kiriye. Çi dibêje xala çil û duyemîn?

*"Tu kes nikare ji mafê perwerdehî û hîndekariyê bêpar were hiştin."*

Wezareta Perwerdehiyê ya Tirkiyeyê, di mijadeya (mewzûat) bi navê "Zagona Perwerdehî û Hîndekariya bi Zimanê Biyanî" de xala 42'a Zagona Bingehîn pûç derdixe û wiha fermanê dide:

*"Ji bilî zimanê tirkî, tu zimanekî din di saziyên perwerdehî û hîndekariyê de nikare bi welatiyên tirk wekî zimanê wan ê dayikê were hînkirinê. ..."**

Li ser ew qas nakokiyan çend pirsên bi vî rengî derdikevine holê:

"Gelo çima li dibistanan dersa zimanê îngilîzî, germanî, frensî, erebî heye û ya kurdî tuneye? Heke zimanê kurdî wekî zimanekî biyanî tê dîtin, wê demê çima nakeve statuya van zimanan? Heke zimanê kurdî ne wekî zimanekî biyanî, zimanê ji malê tê dîtin, wê demê çima dewlet rûmetê nîşan nade û li dibistanan nade xwendin?"




**Bnr. http://mevzuat.meb.gov.tr/html/136.html - Hejmara Zagonê: 2923. Mêjûya Pejirandinê: 14/10/1983. Rojnameya Fermî: 19.10.1983/18196*

HAWAR
Aram Basın Reklam ve Yayıncılık Tic. San. Ltd. Şti.
Adına İmtiyaz Sahibi ve Sorumlu Yazı İşleri Müdürü
Bedri ADANIR
Adres:
Kooperatif Mahallesi
Gevran Caddesi 1 Geçit.
Sarıoğlu Apt. Kat: 4 No:14 Ofis
Yenişehir - Diyarbakır
TEL: 0 (412) 229 00 30
Fax: 0 (412) 229 00 39

Baskı (ÇAP):
Stenbol: Gün Matbaacılık, Reklam, Film, Basım, Yayın, Tan. San. Tic. Ltd. Şti,
Beşyol Mah. Akasya Sok. No: 23/A
Sefaköy - Küçükçekmece İstanbul
Tel: 0 (212) 580 63 80
Edene: Arslan Güneydoğu Gazetecilik, Matbaacılık, Kağıtcılık A.Ş
İstiklal mah. İstiklal. Cad. No: 44 Seyhan Edene
Yayın Türü: Süreli

www.arsivakurd.org

# Şer qediya êrîş neqediyan



Li Srî Lankayê digel gerîlayên Tamîl dawî li şer anîn, êrîşên hovane dewam dikin û kuştina bi hezaran kesan, bi fîşekên hewayî pîroz dikin. Rêveberiya Srî Lankayê îdia kir ku wan lîderê avakar yê Pilingên Tamîlê Velupillaï Prabhakaran û 3 lîderên din jî, kuştine. Gerîlayên Pilingên Tamîlê, ji bo pêşiya kuştina gelê xwe bigirin û sedema kuştina gelê Tamîlê ji destê Srî Lankayê bigirin, dawî li şer anîn. Ji berpirsiyarên Pilingên Tamîlê Selvarasa daxuyaniyek da û got ku şerê li herêmê bi awayekî trajîk bi dawî bûye.

Rayedarê Pilingên Tamîlê bal kişand ser wehşeta hêzên Srî Lankayê yên li hemberî sivîlan û got: "Yên di şer de dimirin, gelê me ye. Êdî em nikarin mirina gelê xwe ragirin. Em nikarin zirarê bidin gelê xwe. Ji bo pêşîgirtina komkujiyan, tenê riyek ma. Ew jî ji destê dijminanan girtina sedema kuştina gelê me ye. Ji ber vê, me biryar girt ku êdî çekan rawestînin".

Rayedarê Pilingên Tamîlê anî ziman ku ji bo pêşiya komkujiyan bigirin, wê hemû tiştan bikin û got: 'Heger bêdengkirina çekan tê wateya destpêkirina pêvajoya aştiyê, ji xwe em vê qebûl dikin. Rayedarê Pilingên Tamîlê da zanîn ku ew ê têkoşîna ji bo gelê Tamîlê jî, bi rêbazên cur be cur bidomînin û li hemberî komkujiyan banga berpirsyariyê li raya giştî ya cîhanê kir.

Hikûmeta Srî Lankayê, ku pêr li hemberî gerîlayên Pilingên Tamîlê serkeftina xwe îlan kir, doh jî îdia kir ku wan lîderên Tamîlî jî kuştin. Berdevkekê Srî Lanka îdia kir ku lîderê avakar yê Pilingên Tamîl Velupillai Prabhakaran, kurê wî û 3 lîderên din kuştine. Çavkaniyên serbixwe heta niha îdiaya kuştina lîderê Tamîlî piştrast nekirin. Tê payin Serokdewletê Srî Lankayê îro li parlamentoyê biaxive, serkeftina li hemberî Pilingên Tamîlê bi awayekî fermî îlan bike. Hêzên Srî Lankayê di rojên dawî de, herî kêm 6 hezar û 500 sivîl jî kuştin û herêma Tamîl vegerandin gola xwînê. Piştî daxuyaniyên Pilingên Tamîlê û hikûmeta Srî Lankayê, bi hezaran srîlankî derketin kolanan, komkujiyên li hemberî gelê Tamîlê bi fîşekên hewayî pîroz kirin. COLOMBO

# 'Bila Demîrel, Çîller û Agar bên darizandin'

**Di Hefteya Windayan de li gelek bajaran çalakî hatin lidarxistin. Di çalakiya Enqereyê de Parlamentera DTP'ê ya Îdirê Pervîn Buldanê xest ku ji ber windayan Demîrel, Çîler û Agar jî bên darizandin**

Parlamentera DTP'ê Pervîn Buldan ku di panela "Hefteya Windayan" de axivî, diyar kir ku berpirsiyarê kuştinên kiryarnediyar Mehmet Agar, Suleyman Demîrel û Tunsu Çîller in. Buldan diyar kir ku divê kesên wê demê wezîfedar bên darizandin.

Navenda Giştî ya ÎHD'ê bi boneya "Hefteya Windayan" li Kolana Yukselê daxuyaniyek da çapemeniyê. Koma li ber Bîrdara Mafên Mirovan hate cem hev pankarta, "Tirkiye ji bo welatiyan ji windakirinên zordarî biparêze, bila peymanên navneteweyî îmze bike" vekir. Serokê




Giştî yê ÎHD'ê Ozturk Turkdogan diyar kir ku heta berpirsiyarên kuştinên bêdaraz neyên darizandin, aştiya civakî pêk nayê.

**'Berpirsyar wezîfedar in'**

Parlementera DTP'ê ya Îdirê Pevrîn Buldan jî diyar kir Tirkiye welatek ji bûyerên windakirin û kuştinên kiryar nediyar dûr nîne û ev tişt gotin: "Bi salan li vî welatî gelek hemwelatiyên me hatin binçavkirin. Xizmên windayan û saziyên mafên mirovan e bi salan anîn ziman. Lazim e êdî gav bên avêtin. Ji bo vê jî divê ligel wezîfedarê wê demê Agar, Demîrel û Çîller bên darizandin. Ev kes ji hemû kuştinên kiryar nediyar berpirsyar in. Ku pirsgirêka kurd bê çareserkirin dê ev bûyer jî zelal bikin û aştî pêk bê."

**Li Meletiyê çalakiya ji bo windayan**

Nûnerên partiyên siyasî, sendîka û rêxistinên sivîl ên civakî yên li Meletiyê, bi munasebeta Hefteya Mafên Mirovan li ber Şaxa ÎHD'ê hatin cem hev û daxuyanî dan çapemeniyê. Koma ku sloganên "Bila winda bên dîtin hesab bê pirsîn", "Bila bîr bên vekirin winda bên dîtin" avêtin, dovîzên wêneyên kesên winda li ser rakirin. Serokê Şaxa ÎHD'ê ya Meletiyê Ozgur Karakavak daxuyanî da, bal kişand ser bîrên mirinê yên bi lêpirsîna Ergenekonê re hatin vekirin û xwest berpirsyar bên darizandin. Karakavak, derbirî ku ji bo winda neyên jiyîn divê sererastkirinên pêwîst ên zagonî werin pêkanîn Karakavak ku xwest êdî windakirin neyên jiyîn, diyar kir ku ew dixwazin mirov di nava azadî, aştî û biratiyê de bijîn. Karakavak, daxwaz kir ku sûcdar bên darizandin. Koma qelebalix piştî daxuyaniyê 5 deqeyan çalakiya rûniştinê lidar xist. ENQERE / MELETÎ / DÎHA

## TÎHV çû serdana zarokên mexdûr

**COLEMÊRG**

Endamên Weqfa Mafên Mirovan a Tirkiyeyê (TÎHV) Coşkun Ustercî û Dr. Mehmet Çokmermercî bi malbat û zarokên di bûyerên di navbera salên 2008 û 2009'an de pêk hatin de rastî şîdeta polîsan hatibûn, hevdîtin çêkirin. Endamên TÎHV'ê çûn serdana Cuneyt Ertuş ku di bûyera 2008'an a li Colemêrgê qewimî bû û di encamê de milê wî li ber kamerayan hatibû şikandin. Her wiha heyet çû serdana zarokê bi navê Sînan Çiftçî ku dibin panzerê de mabû û herî dawî çûn serdana zarokê bi navê S.T' ku di encama bûyerên di 23'yê Nîsanê Cejna Zarokan de rastî lêdana bi qontaxa çekê ya tîmekî taybet hatî.

## Doz li 6 leşkerên îşkencekar vekir

**MÊRDÎN**

Li 6 leşkerên payedar ên Fermandariya Cendirmeyan a Şemrexê ji ber ku bi ser malan de digirin, li gundiyan îşkence dikin doz hat vekirin û ji ber vê hat xwestin ku 12 sal ceza li wan bê birîn. Li gorî agahiyên hatin bidestxistin li navçeya Şemrexa Mêrdînê 6 leşkerên payedar bi awayê kêfî bi ser malan de girtine, li gundiyan îşkence kirine doz hat vekirin. Di dozê de tê gotin ku leşkeran erka xwe ya cemaweriyê bi armancên neyînî bi kar aniye, bi çekan gef li gundiyan xwarine, tacîza malan kirine. Li ser vê di Dadgeha Esliye ya Şemrexê doz hat vekirin. Lê ji bo destûr ji Dadgeha Dadê bê standin Serdarê bi navê SA jî ji dozê cihê hat girtin.

## Hişkesaliyê îsal jî perîşan kir

**RIHA**

Ji ber hişkesaliya îsal, xaka li ser sînorê Sûriyeyê berhemdariya xwe ji sedî 70 winda kir. Endezyarê Çandiniyê Mehmet Tekçe, diyar kir ku ji ber bêaviyê ax qelişiye, çandinî zirareke mezin dîtiye, simbil negirtiye û ên ku girtine jî hundirê wan vala dimîne. Li herêmê ji ber bêaviyê hişkesalî tê jiyîn û di çandiniyê de berhem kêm bûne. Ji ber germbûna hewayê û bêaviyê ax diqelişe. Endazyarê Çandiniyê Mehmet Tekçe, daxuyand ku qelaşên di nav zeviyan de vebûne qasî cihê lingê mirovan e û wiha got: "Hişkesaliya sala berê, çotkarên hêrêmê ji sedî 90'î xiste zirararê. Lê îsal jî hêviya catyaren pêk nehat û bi heman xesraê re rû bi rû man."

## Polîs li kolanan îşkence dikin

**STENBOL**

Omer û Nusrettîn Îşleyen ku dema ji bo wesayîta xwe bifroşin çûn Bazara Wesayîtan a li Kartalê û wesayîta xwe li cihekî xelet park kirin, wesayîta wan ji aliyê polîsan ve hate kişandin. Omer Îşleyen û bavê wî Nurettîn Îşleyen, wexta ji bo girtina wesayîta xwe çûn otoparkê li şûna 50 TL'yî 200 TL ji wan hate xwestin. Omer Îşleyen û bavê wî Nurettîn Îşleyen, îdia kirin ku ji ber pere nedane rastî lêdana polîsan û peywirdarên otoparkê hatine. Omer Îşleyen got ku bavê wî ji ber lêdanê rapor jî girtiye.

## Li Elkê cerdevanan êrîşî DTP'iyan kir

Hate zanîn ku li navçeya Elkê sercerdevan Reşît Durmuş û cerdevanên girêdayî wî bi sedema der barê wan de nûçe di çapemeniyê de derketine êrîşî DTP'iyan kirine.

Der barê sercerdevan Reşît Durmuş û cerdevanên xizmên wî de bi boneya zordariyê li welatiyan dikin, di çapemeniyê de nûçe derketibûn. Sercerdevan Durmuş piştî nûçeyan duh êvarê bi xizmên xwe re êrîşî DTP'iyên li navenda navçeyê li ber qehwexaneyekê rûniştibûn, kir. Di êrîşê de hin cerdevan birîndar bûn. Her wiha polîsên piştî êrîşa cerdevanan hatine cihê bûyerê jî cerdevan binçav nekirin. Hate zanîn ku gengaşiya duh êvarê dest pê kirî, li navçeyê berdewam dike. Piştî hilbijartina 29'ê adarê bi boneya DTP'ê şaredarî bi dest xist, cerdevanan bi çekan û keviran êrîşî malên DTP'iyan kiribû. ŞIRNEX

## Li Silopiyê 35 xwedakar girtin

Piştî êrîşa 14'ê nîsanê ku bi fermana hikûmetê polîs bi ser endamên DTP'ê de girt û 3 jê cîgir bi sedan kes girt binçav bê ku raweste didome. Balkêş e ku di demên dawî de polîs ciwan û xwendevanên girêdayî YGD-M'ê kirine hedef. Duh jî polîsan piştî xwepêşandana xwedevanan bi ser dibistana Silopiyê de girt û 35 xwendevan girtin binçavan.

**35 xwendekar girtin binçav**

Xwendekarên Lîseya Silopiyê ji ber 6 hevalên wan li dibistanê ji aliyê polîsan ve hatin binçavkirin, xwestin vê yekê bi meşekê şermezar bikin. Polîsên ku destûra xwepêşandanê nedan, bi bombeyên gazê û ava şidî mudaxeleyî xwendekaran kiribûn. Piştî mudaxeleyê di encama serdagirtinên malan de 4 xwendekar hatibûn binçavkirin. Piştî bûyerên hatin jiyîn ekîbên polîsan ên çûn Lîseya Silopiyê, 35 xwendekarên din jî girtin binçav. Xwendekar hatin binçavkirin birin Midûriyeta Polîsan a Navçeyê.

**Li Cizîrê bi ser malan de digirin**

Li navçeya Cizîrê di encama serdagirtinên malan de 3 kes hatin binçavkirin. Li gorî agahiyan yekîneyên Midûriyeta Polîsan a Cizîrê li Taxa Nuhê şevtira din di ser gelek malan de girtine. Di encama serdagirtinan de Metîn Gengeç, Mesut Acet û Abdulazîz Şanli hatin binçavkrin. Sedema binçavkirinan nehat zanîn. Kesên hatin binçavkirin li Midûriyeta Polîsan tên girtin. ŞIRNEX

### Li Geverê çalakiya şermezarkirinê

Rêxistina DTP'ê ya Navçeyê û YDG-M bi armanca şermezarkirina zordariyên li ser xwe dê daxuyaniyeke girseyî bidin çapemeniyê. Li Geverê ku operasyona li hemeberî DTP'ê berdewam dike, binçavkirin jî didomin. Li hemberî vê yekê Rêxistina DTP'ê ya navçeyê û YDG-M bi armanca şermezarkirina zordariyên li ser xwe dê daxuyaniyeke girseyî bidin çapemeniyê. Îro seat di 10.00'î de girseya li ber Rêxistina DTP'ê dicive de heta ber Otela Osluyê meşekê pêk bîne. Di daxuyaniya li vir bê dayîn de zordariyên li ser DTP û YDG-M'ê dê bên şermezarkirin. endamên YDG-M'ê bamga beşdariyê li hemwelatiyan kirin.

## Ji bo testa DNA'yê 16 malbatan serî lê dan

Ji bo hestiyên ku di gora tomarî ya li Çiyayê Helkîsê hatine dîtin her diçe serlêdan zêde dibin. Serokê Şaxa ÎHD'a Êlihê Osman Kunteş diyar kir ku 16 malbatan der barê hestiyên ku li çiyayê Helkîsê hatine dîtin de serî li wan daye. Kunteş anî ziman ku di lêkolîna ku li çiyayê Helkîsê hatiye kirin de hestî û tasa serî hatine dîtin. Kunteş wiha dirêjî da axaftina xwe: "Em ê bi malbatên ku serî li me dane re serî li noterê bidin û em ê wekaletê bidin parêzeran. Parêzer dê di warê hiqûqî de çi pêwîst be dê bike. Piştre jî dê ji malbatan mînakên xwînê bê girtin û dê testa DNA'yê bê kirin." Malbat bi israr in ku cenazeyên wan bên dîtin û teslîmê wan bê kirin. ÊLIH

## ÎHD sibê bi dozgerê Kiriklarê re diaxive

Heyeta ku ji parazvanên mafên mirovan û perêzeran pêk tê ji bo ku pirsgirêkên girtîgeha Kiriklara Tîpa F a Îzmîrê ragihînin, roja 20'ê gulanê dê bi dozgerê girtîgehê re biaxivin.

Dihat payîn ku duh ev hevdîtin pek bê. Lê dozger ji ber hinceta karê zêde hevdîtin heta roja 20'ê mehê taloq kir. Endamê Desteya Rêveber a Şaxa ÎHD'ê ya Îzmîrê Canan Uçar li ser hevdîtinê agahî da. Uçar got ku hefteya borî wî bi girtiyên Kiriklarê ya Tîpa F ya 2'emîn re hevdîtin kiriye û di hevdîtinê de hatiye gotin ku pirsgirêkên girtîgehê her diçe zêde dibin. Di vê çarçoveyê de weşanên bi kurdî, rojname, pirtûk nayên dayîn. Ragihandina bi kurdî rastî cezayê dîsîplînê tê. Uçar destnîşan kir ku Serokomarê Tirkiyeyê Abdullah Gul berovajiyê vê bi daxuyaniyên xwe hêviyên mezin dide Tirkiyeyê, lê di girtîgehan de berovajiyê vê pêk tên. Li gel ku der barê wan de tu biryarên dadgehê yên berhevkirinê nîn e jî rojnameya kurdî ya Azadiya Welat, Hawar nadin girtiyan.

**Nexweşan derman nakin**

Parêzer Uçar mînaka Abdulsamet Çelîk nîşan da û derbirî ku girtiyên nexweş nayên dermankirin û der barê Çelîk de ku nexweşê îlîkê ye de wiha got: "Abdulsamet Çelîk li nexweşxaneya Perwerde û Lêkolînê ya Ataturk tê dermankirin. Lê ev nexweşxane ji bo girtiyan ne guncan e. Çilîk di nexweşxaneyê de qatek di bin erdê de wek di nav bîrekî de be hat girtin. Odeya ku lê dima 24 saet lambe vêdikeve. Daxwaza wî ya 'odeyek ku rojê dibîne' jî nehat qebûlkirin û ew vegerandin girtîgehê. Piştî ewqa ezyet gelo niha ilîk bê dîtin û ew bê dermankirin dê çiqa şîfa bibîne?"

Uçar aşkera kir ku ew dê piştî hevdîtina bi dozger re ku pêwîst bike dê daxuyanî bidin ragagiştî jî. ÎZMÎR / ANF

www.arsivakurd.org

# Gul: Hamaset zirarê dide me

## Serokomarê Dewleta Tirk Abdullah Gul livbaziya xwe ya dîplomasiyê didomîne. Gul piştî Tehran û Bexdayê çû Şamê. Gul ji Şamê bersiv da rexneyên MHP'ê û CHP'ê û got: 'Propagandaya tirkan ji bo tirkan nekin'

**NAVENDA NÛÇEYAN** AMED

Serokomarê Dewleta Tirk Abdullah Gul piştî serdanên xwe yên ji bo Tehran û Bexdayê dawiya hefteyê li Şamê bû. Gul ji Şamê jî peyamên ji bo çareseriya pirsgirêka kurd dan û anî ziman ku pirsgirêkên Tirkiyeyê dê bi riya demokrasiyê bêne çareserkirin. Gul ji Şamê bersiv da rexneyên MHP'ê û CHP'ê jî.

Serokomarê Dewleta Tirk Abdullah Gul dîplomasiya xwe ya bi welatên parvekerên axa Kurdistanê re bênavber didomîne. Gul piştî ku di meha adarê de çûbû Tehran û Bexdayê dawiya hefteyê jî li Şamê bû. Her çiqas ji bo qada navneteweyî hatibe ragihandin ku Gul ji bo navbeykariya Sûriye û Israîlê çûye Şamê, aşkera bû ku rojeva sereke ya vê serdanê jî pirsgirêka kurd bû.

Gul ji Şamê jî peyamên ji bo çareseriyê dan. Lê dîsa jî nexşeriyeke ji bo çareseriyê bi lêv nekir. Gul bi tenê qala televîzyona kurdî û azadiya çapemeniyê kir û nêrîna xwe ya ji bo çareseriyê dubare kir.

**Ji bo Bahçelî û Baykal çi got?**

Gul li Şamê bersiv da rexneyên Serokê Giştî yê MHP'ê Devlet Bahçelî û Serokê Giştî yê CHP'ê Denîz Baykal û got: "Dest ji hamasetê berdin û ji bo çareseriyê piştgiriyê bidin. Serokên partiyan siyaseta rojane dikin. Mafdar in. Ez tu caran bi wan re nakevin nava polemîkê. Siyaseta rojane nakin. Ez ê guhdarî bikim û bişopînim. Ew jî mecbûr in ku tiştekî bêjin. Lewre serokê partiyekê mecbûr e ku her roj baxive. Ev tişt normal in. Lê pirsgirêkên bingehîn nabe ku bi hêviya hikûmetê ve bên hiştin."

Gul wiha dirêjî da gotinên xwe: "Dema standart bilind dibin pirsgirêk jî ber bi çareseriyê ve diçin. 15 salan beriya niha bingeh ev qas musaîd nebû. Demekê di televîzyonan de bi kurdî axaftin sûc bû, axaftin sûc bû. Lê niha ne wisa ye." Gul di dewama gotinên xwe de anî ziman ku pirsgirêk encax bi bîlindkirina standartên demokrasiyê pêkan e.

**Gotinên Altan bi bîr xistin**

Gul bal kişand ser helwesta medyayê ya der barê başûr Kurdistanê de jî û anî ziman ku ûsluba tê bikaranîn zirarê dide Tirkiyeyê. Gul wiha got: "Berjewendiyên me yên aborî hene. Bitenê qala kirîn û firotina malî nakim. Çavkaniyên enerjiyê jî li vir in. Di van mijaran de divê em nekevin nava hamasetê." Gul ji nivîskarê navdar ê tirk Çetîn Altan mînak da û got: "Aşkera bêjin, her wekî Çetîn Altan dibêje; 'divê ji bo tirkan propagandaya tirkîtiyê neyê kirin'. Dema wisa tê kirin berjewendiyên me yên neteweyî zirarê dibînin."

**'Xebatete berfireh tê kirin'**

Serokomarê Dewleta Tirk Gul anî ziman ku ew ji bo çareseriyê xweşbîn e û wiha dirêjî da gotinên xwe: "Gotina min a ji bo 'fersenda dîrokî' nêrîna dewletê ya hevpar e. Ev 10 sal in ez di nava pergala dewletê de me. Bi qasî ku tu deman neyî niha ahengsaziya sivîl û leşkeran heye." Li ser pirsa ji bo 'di nava çiqas demê de pirsgirêk dê çareser bibe?' Gul wiha got: "Tirkiye ji bo ku pirsgirêkê çareser bike xebateke berfireh dimenîne."



**ANALÎZ**

### Gul çima karta kurdan bi bîr xist?

Abdullah Gul, bi lezgînî dîplomasiya xwe ya bi dewletên bi kurdan re xwedî pirsgirêk, pêk tîne. Piştî Tehran û Bexdayê çû Şamê jî.

Gul li Şamê ligel bersiva rexneyên Bahçelî û Baykal da, îşaretên ji bo niyeta dewleta tirk a pêşerojê jî da. Gul dibêje, têkiliya me ya bi başûrê Kurdistanê re bi tenê ne di çarçoveya kirîn û firotinê de ye. 'Li wir çavkaniyên mezin ên enerjiyê jî hene'.

Vê gotina Gul siyaseta kurd dê çawa şîrove bike? Yek ji krîterên dîplomasiyê bazar e. Derdorên dîplomasiyê dimeşînin, qertên xwe çiqas bi hosteyî karbînin, ew qas serkeftî dibin. Gul, di qada dîplomasiyê de kesekî gehiştiye. Zû bi zû qarta muxatabê xwe venabêje. Lê li Şamê me mecbûr ma ku vê qartê bîne bîra muxalefeta Tirkiyeyê.

Hê jî vekirîtir ev bêjin: Gul dibêje, ji bo kilê çavê kurdan em li ber çareseriyê nagerin. Pirsgirêka kurd, bêyî me jî be dê ber bi çareseriyê ve biçe. Em wekî dewlet ji bo berjewendiyên xwe mecbûr in ku tevlî vê pêvajoyê bibin.

Raveya vê helwestê ji bo siyaseta kurd –li çar parçeyên welat- ew e: Hêzên navneteweyî yên ku berjewendiyên wan bi Rojhilata Navîn heyî, baş fêmkiriye ku heta pirsgirêka kurd çareser nebe, herêm aram nabe. Lewre kurd ji çar neteweyên bingehîn ên herêmê yek in. Her sê neteweyên din –tirk, ecem û ereb- pirsgirêka wan bi kurdan re heye. Mêtînkarên axa Kurdistanê ne.

Her wiha kurd, dînamîka herî bi livûbaz a herêmê ne. Her çiqas xwedî dewlet nebin jî bi livûtevgera xwe bûn aktorekî bingehîn ê herêmê. Gul vê yekê baş dibîne. Û ligel ku vê rastiyê fêm dike, tîne ziman ku 'wekî dewlet wan girîngiya pirsgirêka kurd fêmkiriye û konsensûke di çarçoveya berjewendiyên xwe de difikirin'. Tirkiye wekî 'birayê mezin ê mêtînkar' ji bo ku di vê pêvajoyê de serkeftî bibe lez daye dîplomasiyê. Her wiha zelal e ku dewleta tirk di vê çarçoveyê de planeke mezin a dîplomasiyê pêk tîne.

### Rewşenbîr ji bo çareseriyê ji nû ve dikevin dewreyê

Asta ku niha pirsgirêka kurd tê de ye, bandor li ser rewşenbîran jî kir. Rewşenbîran biryar da ku di rojên pêş de bi rêveberên partiyên siyasî yên ku di meclîsê de ne re hevdîtinan pêk bînin. Rewşenbîrên ku lez dane xebatên xwe, dê pêngavên şênber ên ji bo çareseriyê ji rêveberiyên partiyên siyasî daxwaz bikin.

Li gorî agahiyên ku hatine bidestxistin daxuyaniyên Lîderê PKK'ê Abdullah Ocalan û Serokomarê Tirkiyeyê Abdullah Gul, rewşenbîr jî kirine nava tevgerê. Demek berê rewşenbîr û nûnerên rêxistinên civaka sîvîl ji bo ku pirsgirêka kurd bi awayekê demokratîk bê çareserkirin, li Stenbolê hatibûn cem hev û ji bo biryara însiyatîfek nû nîqaş kiribûn.

Di nava wan de Serokê Yekitiya Tabibên Tirk Gencay Gursoy, cîgirê Muşteşarê MÎT'ê yê berê Cevat Oneş, Berdevkê Koma Aştiyê Seydî Firat, Nivîskar û Rojnameger Cengîz Çandar, Siyasetzan Dogu Ergîl, Serokê KESK'ê Samî Evren, Serokê DÎSK'ê Suleyman Çelebî jî hene, li ser vê nexşerê lihevkirin:

**Şer xwe ferz dike, hûn ê çi bikin?**

"Rewşenbîr û nûnerên rêxistinên civaka sîvîl ji bo ku biçin serdana hemû nûnerên partiyên siyasî, dê heyetekê ava bikin. Heyet, dê partiyên ku di meclîsê de cih digire, navendên CHP, MHP, AKP û DTP'ê ziyaret bike. Di serdanê de dê vê peyamê bidin lîderan; Pirsgirêka herî girîng ya Tirkiyeyê pirsgirêka kurd e. Ji pirsgirêkê girîngtir pirsgirêk nîne. Lê der barê vê pirsgirêkê de, ji bo çareseriyê, pêşniyarek bi hêvî ya partiyên siyasî tuneye. Piştî 1'ê hezîranê dê şer dîsa dest pê bike. Her wiha rojên pêş be pira siratê ye. Ji bo ku hêdî xwîn neyê rijandin, ji bo çareserkirina pirsgirêkê hunê çi bikin."

**Ronakbîr çareseriyê nîqaş dikin**

Kesekî ku nexwest navê xwe bide diyar kir ku di 2005'an de jî rewşenbîr û nûnerên rêxistinên civaka sîvîl ketibûn dewreyê û wiha pê de çû :"Em bi rewşenbîr û nûnerên rêxistinên civaka sîvîl re dem dem tên cem hev û nîqaşan dikin. Em dikarin şênber çi bikin? Hêdî dema vê hat. Ji bo ku ev pirsgirêk çareser bibe, divê em zorê bidin ser nûnerên partiyên siyasî. Ji ber vê jî di rojên pêş de emê têkevin nava hewldanan ku partiyên siyasî bên ser peywirê. Heviya me rewşenbîran heye ku dê pirsgirêk çareser bibe. Eger ku partiyên siyasî jî di nava vê hêviyê de bin, em ji bo çareseriyê tu astengiyê nabînin."

### Hewldan bo çareseriyê zêde dibe

DÎSK, KESK, TTB, TMMOB, partiyên siyasî û gelek saziyên civakî biryar dan ku têkildarî pirsgirêka kurd bi Serokomar Abdullah Gul û Serokwezîr Recep Tayyîp Erdogan re biaxivin. Hate zanîn ku sazî ji bo piştgiriyê bidin çareseriyê dê bi partiyên komên wan li Meclisê AKP, CHP, MHP û DTPê re jî biaxivin. Hate zanîn ku heyetê ji partiyan, Gul û Erdogan randevû xwestine. Heyet ku randevû bigire dê ji bo çareseriya pirsgirêka kurd piştgiriyê bixwaze. Bi taybetî dê daxwaza, "Pêşiya pirsgirêkê nekirin, piştgiriyê bidin çareseriyê" bê kirin. Heyet dê ji hikûmetê jî bixwaze ku ji bo çareseriyê gavên ber bi çavan bavêje. Heyet dê bixwaze ku pêvajoya bêçalaktiyê bê aafirandin û hawirek çareserî bê axaftin ava bike. Di hevdîtina bi Gul re de jî dê peyama, "Em piştgiriyê didin daxuyaniyên te. Zêdetir înîsiyatîfê bigire" dê bê dayîn. Heyet dê diyar bike ku ji bo çareseriyê tişta dikeve ser milê wan dê bikin. Lê hate zanîn ku ev 4 roje hêj daxwaza randevuyê ya saziyan nehatiye qebûlkirin. **ENQERE**

## Amadekariyên mîtîngê didomin

Amadekariyên mîtînga herêmî ya ku dê bi slogana "DTP'ê bêdeng neke, çekan bêdeng bike, bersivê bide biryara bêpêvçûnê" di 23'ê gulanê de li Qada Newrozê ya li ber Keleha Wanê pêk bê didomin. Komîteya Amadekar a mîtîngê bang li hemû kesan kir ku tevî mîtîngê bibin.

Amadekariyên mîtînga herêmî ya ku dê bi slogana "DTP'ê bêdeng neke, çekan bêdeng bike, bersivê bide biryara bêpêvçûnê" di 23'ê gulanê de li Qada Newrozê ya li ber Keleha Wanê pêk bê bi lez didomin. Serokê Komîteya Amadekar a Mîtîngê Ramazan Kamaç ku der barê xebatan de agahî dan, diyar kir ku xebatên xwe bi lez didomînin û destnîşan kir ku ji bo şermezarkirina konsepta antî-demokratîk a li dijî DTP'ê mîtînga herêmî lidar dixin. Kamaç, derbirî ku ji ber mîtîng herêmiye wateyek mezin didin. Kamaç, diyar kir ku di 23'ê gulanê de bi tevlêbûna Hevserokê DTP'ê Ahmet Turk, parlementer û şaredarên DTP'î dê mîtîng bê pêkanîn. **WAN / DÎHA**

## Dogan berê xwe da gaza Başûr

Dogan Holdîn û hevkarê wê Perol Ofîsiya Awisturyayê OMV û ligel 3 hevkarên din, xwe amade dikin ku li Başûrê Kurdistanê dest bi derxistina neftê bikin.

OMV'ê bi şîrketa gaza xwezayî ya taybet a Rojhilata Navîn Dana Gas û şîrketa petrol û gaza xwezayî ya taybet a berê ya herêmê Crescent Petrolium re li hev kir û ji bo ku li başûrê Kurdistanê gazaxwezayî derkeve peyman îmze kir. Her wiha fîrmaya Macar Deva Petrol a Molê jî îmzeya xwe avêt peymanê. Vê fîrmayê di dema taybetkirina Tupraşê de nêrîna xwe derxistibû holê.

Li gorî malpera Gazeteportê di peymana ku hatiye îmzekirin de dê mîktar û kalîteya gazaxwezayî zêde bikin û li ser Tirkiyeyê gazaxwezayî bifirojin Ewropayê. Ji sedî 16.67 hîseya OMV û Mol'ê di projeya Nabuccoyê de heye. Ev jî ji bo ku gazaxwezayî li Başûrê Kurdistanê derkeve û îxracê Ewropayê bê kirin girîng e. Li gorî peymanê OMV'ê bi 350 mîlyon dolarî, ji sedî 10 bûye hevkarê Pearl Petroleumê. Her wiha di projeyên derketina gazaxwezayî de jî, dê di razemeniyan de bibe hevkar. Macar Mol jî li şûna ku razemeniya xwe pêşîn bike, li Dana Gas û Crescentê, dê ji şîrketên xwe ji sedî 3 hîseyê bide û dîsa li Pearl Petrolumê ji sedî 10 bû hîse bidest xist.

Hate hînbûn ku rêveberiya Herêma Fedaral a Kurdistanê jî bi awayeke germ li peymanê mêze dike û ji bo ku sahayên gazaxwezayî tespît bibin û bê derxistin dê derfetan bidinê. Dana Gas û Crescentê di du salên dawî de dîsa li Herêma Federal a Kurdistanê sahaya gazaxwezayî ya Khor Morê girtibû û 176 kîlometre înşata boruyan temam kiribû û gihandibû santralên gazaxwezayî. **ENQERE**

## Ji Şaredariya Tetwanê danasîna proje û şanoyê

Şaredariya Tetwanê bi slogana, "Kesek kompîtûrê nezane namîne: Di ragihandinê de hedef miloyen ciwan' projeyek da destpêkirin.

Şaredariya Tetwanê û Meclisa Ciwanan a Tetwanê (TAGEM) di çarçoveya li tevahiya Tirkiyeyê bi slogana, "Kesek kompîtûrê nezane nezane namîne: Di ragihandinê de hedef miloyen ciwan' de dest bi xebatan kirin. Bi armanca danasandina projeya li Navenda Çandê ya Şaredariya Tetwanê hate danasandin. Şaredarê Tetwanê Abdullah Ok, rêveberên DTP'a Tetwanê û gelek kes beşdarî civîna çapemeniyê bûn. Endamên TAGEM'ê Cîhan Kaplan û Mehmet Gurbuz derbarê projeyê de agahî dan û balkişandin ser girîngiya asta ragihandin û hewceyiya wê. Kaplan, anîn ziman ku hêviya wan ew e hemû şaredariyên navçe û bajaran piştgiriyê bidin vê projeyê. Piştî danasîna projeyê Koma Şanoyê ya Şaredariya Tetwanê ku ji 20 xwendekarên lîseyê pêk tê, derket ser dikê. **BEDLÎS**

## 7 partî beşdarî hilbijartinê nabin

Li başûrê Kurdistanê 7 rêxistinan aşkera kir ku ew beşdarî hilbijartinên parlemenê yên miha tîrmehê nabin.

Desteya Hilbijartinê ya Herêma Federal a Kurdistanê jî piştrast kir ku 7 rêxistinên beriya niha serî li wan dabûn da beşdarî hilbijartinhe bibin, serlêdana xwe bipaş de kişandine. Hate hînbûn ku rêxistinên xwe ji hilbijartinê vekişandine ev in: Partiya Parastina Kurdistanê, Civaka Biratî ya Xirîstiyanan, Partiya Kedkarên Serbixwe, Partiya Demokrat a Beth-Nehrîn, Nîştîmanperwerên Demokratîk, Lîsteya Serbixwe ya Spî, ji kotaya Ermeniyan Şal Akop Murad.

Di vê navberê de hate hînbûn ku Serokê Herêma Federal a Kurdistanê Mesûd Barzanî û Serokwezîrê Iraqê Nûrî el Malîkî hevdîtinê pêk tînin. Çavkaniyên Parlementoya Iraqê ragihandin ku Barzanî û El Malîkî di rojên pêş de ji bo guftûgokirina pirsgirêkên dinavbera hikûmetên Hewlêr û Bexdayê dewê bicivin. **HEWLÊR / BEXDA**

www.arsivakurd.org



# Gulan e Mizgîn e

*Stêrkek geş dibe ji Êlihê*
*Ronî dide ronî dide!*
*Bi Egîdê leheng re*
*Tevlî meşa azadiyê dibe!*
*Kulîlkek li Kurdistanê vedibe*
*Bi deng û rengê xwe...*
*Bêhna sosin û nêrgizan belav dike*
*Bi xemla Erûh û Şemzînanê...*
*Geştir dibe.*
*Straneke bi awaz bilind dibe*
*Newa bi newa...*
*Bi dengê şoreşa vejînê...*
*Ji Lubnanê heta Ewropayê...*
*Li çar parçeyên Kurdistanê...*
*Şopa lehengan dinexşîne.*
*Mizgînek...*
*Stranek...*
*Şoreşgerek!...*
*Di bihareke rengîn de*
*Bi birîndarî dikeve kemînê...*
*Di bihareke ji biharên Serhedê!*
*Lê bi evîndariya xwe...*
*Bi awaza xwe*
*Destana berxwedanê...*
*Destana stranan dinivîsîne.*
*Mizgîn e Gulan e, stran e!*
*Li Tetwanê...*
*Hêviya biharê dinexşîne...*
*Ji rêwiyên çiyê û berxwedêrên li zindanan re*
*Strana "Lo hevalno" dibêje.*
*Mizgîn e!*
*Bi dengê xwe yê xweş...*
*Rûpelên hunera kurdî dixemilîne*
*Ji dengê bilbilan...*
*Ji pêşerojan re...*
*Mizgîniyên xêrê tîne.*

**DÎLAN AYDIN**

**NECÎM ABDULAH**

# Xewneke nûgihîştî

Bi rê ketibû û dihat dema ku serî danîbû ser balîfa xewê û tanî bîra xwe demên bihurî

Yek caran dema ku ew û hevala xwe ya ciwan, ya bi navê Nêrgiz bi hev re berê xwe didane dibistanê û ji hev re behsa serpêhatiyên xwe dikirin. Ew hevala wî ya zarokatiyê bû û her du ji gundekî bûn û di eynî temenî de bûn, lewma pir ji hev hez dikirin û tu caran ji hev venediqetiyan.

Rojekê ji rojên biharê dema ku her duyan destê xwe xistibû nava destên hev û dilê wan weke du çûkan dikire çîveçîv û berê xwe didane nava dehl û deviyan, nava darên xox, sêv û gûzan. Çiqas rojên xweş û şad bûn, ew roj zû derbas dibûn li ber çavên wan û weke ku tu çavê xwe bigirî û vekî her tişt weke xewnerojkan li ber bayê payîzê tar û mar dibû û weke pelên payîzê xwe li ber bayê hênik û sivik dihejand û xatir ji cîhana xeyalan dixwest.

Erê hevalê Bawer tim dihate bîra min dema ku te ji me re behsa zarokatiya xwe dikir û her gav û wext me bi hev re yarî û henek dikirin weke niha her tişt tê bîra min û her dîmen li ber perda çavên min tên û diçin.

Lê tim tînim bîra xwe ew ê ku ew demên xweş û şadî diafirandin em bûn an hinek kesên din bûn ji bilî me. Ji ber ku hestên me wê demê pir geşbûn û me haj ji mirinê nebû û weke zêbeqê tu caran tebat bi me nediket, li ku derê dibû şev ew dibû cih û warê me, birastî jiyana zarokatî

pir xweş e, tê de ne kîn heye ne dirutî ne jî çiqas takekesî hene, her tişt bi hev re tê kirin û hemû bi hev re dixwin û vedixwin û dileyîzin. Ji ber vê yekê min tim dixwest ez piçûkbim û mezin nebim, ji bo ku berû cîhana xapînok û derewîn nexwim.

Lê heyv û mixabin tiştek di destê min de nemabû hinekan nav li min dikirin û hinekan cilê min difesilandin weke miriyê berê wî dikeve gorê û tişta tenê di destê wî de mabû ew bû ku fatîheyeke li ser ruhê xwe bixwînê û xwe radestî qedera bêbext bike.

Lê min weke xelq û alemê nekir û min xwest ez ji mirinê, jiyanê biafirînim, lewma min nehişt ku kes navê min bikin bêkes an bêwar.

Ketim nava daristana navan û ji hemû nav û nîşana min navê xwe kir Bawer û ji baweriya temenê nû gihiştî min şetla xwe di nava baxçê azadiyê de çikand.

Ji nû ve dilê min rehet bû û ketim ser riya dûr û dirêj, ji gelek welatan hatin oldar û dîndar her kesî xwest min bînê ser dîn û dehwa xwe. Hinekan digot em ê cihê însan û riya gihiştina mafê kole û bindestan û hinekan digot guh bidên me em in yê ku yekitiya

gelan tînin ber erşê ezman û ji bilî me kes nikarê xewnên azad bibînê.

Min xweş li gotinê wan guhdarî dikir lê ez ji wan pir matmayî û dilsar bûm.

Heyanî ku roj ji navsera çiyayan derket û bi tîn û tîrêj in xwe hest û ramanê me ronî kir

Bawer naskirina xwe û tevlibûna xwe ji refê bi zavê re bi vî awayî ji me re vedigot û ji bo wî tevlîbûn ji refê gerîleyan re weke xewnekê bû û qet wî bawer nedikir ku wê rojekê werê û wê ew jî weke şervanê azadiyê şal û şapikê kurdî li xwe bike û rext û fîşekan wê li ser kemberê pêçê û çeka namûs û şerefê hilgirê ser milê xwe û weke bazê tolhildanê li çol û çiyayê Kurdistanê bi azad û serfiraz bigere.

Erê rêhevalê Bawer ew xewn û xeyalê ku te dixwest û pêk hat, ne tenê xewn û xeyalên te bû; lê xewn û xeyalê milyonan ciwan û zarokên kurd bû yê ku li ser van xewn

û xeyalan mezin dibûn û pêre dibûne yek weke neynok û goşt.

Dema ku Bawer çavê xwe ji xew vekirin xwe di nava heval û hogirên xwe de dît û dema ku xwest nas bike ka demjimêr çende hevalê wî yê li kêleka wî pê hisiya û jêre bi dengekî melûl got: Çima heyanî niha tu şiyarî

Bawer bi dengekî nizim bersiva wî da ji bo ku hevalê nivistî ji xewê şiyar nebin. Ez nizanim çima îşev xew nakeve çavê min, çiqas ez xwe çep û rast dizivirînim lê bê feydeye ez weke evîndarê ku yara xwe windakirî û dixwazê di nava bêdengiya şevê de wêneyê wê bibînê an jî bi dengvedan wêre bi xewn û xeyalan re dûr û kûr bar bikê.

Hevalê li kêleka wî nivistî bi ken bersiva wî da û got: Evîna welat ser hemû evînan re ye û barê şoreşê pir giran e, lewma ji bo me ne şev şev in û ne roj roj in û tu caran ne wê xew bikevê çavê me û ne wê meremê me pêk werê heyanî ku dayika me Kurdistan ji bin destan rizgar be û gelê me di nava kêf û şahiyê de bi serbest û azad bijî.





## Prof.Mihê Dîn

# Tûya gundê me...

Gelî ezbeniyan,

Ev çend roj in, ez ji rojevê hinekî dûr ketim. Min hewl da ku ji bo du rojan jî be ji teknolojiyê dûr bikevim.

Bav û kalên me çawa dijiyan, min mereq kir.

Min xwest televîzyon nebe, telefon nebe, radyo nebe, rojname nebe.

Heta min xwest pirtûk jî nebin.

Jiyaneke bi tenaser. Ji keftûlefta derewan dûr. Ez û xweza tenaser bin.

Bayê biharê yê li welatê me hildayî pirûşkên biharê ber bi havînê ve dibe. Dar û baran barê xwe ji fêkî giran kiriye. Çiyayan xemla xwe bi hêşiniyê girêdaye. Kaniyên zozanan banî mirov dikin. Vexwarina ava kanîsarkan bi salan e nebûye qismetê me.

Di nava kolanên bajaran de xerqî jiyaneyeke ku ji aliyê hinên din ve teşe jêre tê dayîn bûne.

Ken û giriyê me jî bi destê me nîn e.

Kengî em ê bikenin, kengî em ê bigirin... em birayarê nadin. Hinên din biryara wê jî didin. Daqurtandina kulmek bayê zozanan ji bo me bûye xewna mirinê.

Di nava du rojên ku ji qeft û lefta bajar dûr, bêyî ku teknolojî hebe bijîm xewn û xeyalên zarokatiya li min hay hatin. Bavê min hate bîra min.

Wî qala bapîrê xwe dikir.

Bapîrê bavê min rojê du caran kîsikê xwe yê qelûnê ji tûtina ku wî bi destê xwe digihand dadigirt û dikêşa.

Bi qewlê bavê min, wî 115 sal umir barî. Dema dest biketibûya rojê kulmeke kakilên gûzan dixwarin. Wekî din, çu sirên wî yên têrumriyê nebûn.

Bavê min ji bapîrê xwe 50 salan kêmtir jiya. Em ê ji bavê xwe çiqas kêmtir bijîn nediyar e.

Tê bîra min, pîremêrên gundê me li ber siya tûyê rûdiniştin û roj li xwe dibere ava. Em jî diçûn li dora wan kom dibûn û me sobhetên wan ên li ser jiyanê guhdarî dikirin.

Niha bibîrtinim ku, tiştên ji bo wan mijara kêfxweşiyê bûn ji bo me bûne mijara xemgîniyê. Wan laqêdiyên xwe bi jiyanê dikirin.

Zêde wext ser re derbas nebû. Lê îro difikirim, kes ji wan ên li ber siya tuyê guhdarî dikirin neman.

Çûna wan a tenaser ne tişteke. Em bi çûna wan a tenaser xemgîn nebûne. Heta em wan bi bîr jî nayînin. Erê gelo çima? Çima em ev qas ji paşroja xwe dûr ketin? Dayika min hin caran dema ji me aciz dibû digot: Erê dayê, 'serder bûne binder, binder bûne serder' xweşiya sal û zemanan nema.

Du rojên ez tenaserbûyîm ev gotina dayika min gelek caran hate bîra min.

Gelo, em bûne çi? Heke bav û kalên me îro biyana, em ê bişindina çi? Gelo dêkaribûya di nava jiyaneke wakî ya me ku çarçovekiriye de bijiyana?

Ez bawer nakin.

## HAWARA EYŞO

NERAZÎBÛNA WEKHEVÎYÊ




ŞEWBA BERAZAN




## Qerf û Henek

# Deynê kulînê...

**Rojekê malxweyê malê tenekeyeke tijî helaw tîne malê û ji jinika xwe re wiha dibêje:**

-Vê tenekeya helawê dayne kulînê û bila zar jê nexwin, heta ku Remezan hat.

Piştî çendekê mirovek tê nava gund da ku ji heywanên xwe re ka û cehî bikire. Lewre li derê vê **malê jî dixe û wiha dibêje:**

-Malxweyê malê li mal be, jê re bibêjin heke ka û cehê wî yê firotanê hebe bila ji kerema xwe re derkeve ber derî?

Zarok dibezin cem diya xwe û jê re dibêjin ku mirovekî wiha wiha hatiye ber deriyî û wiha wiha dibêje. Diya wan jî derdikeve ku bibêje malxweyê malê ne li mal e. Lê belê di wê gavê de tê bi bîra wê ku mêrê wê wiha gotiye "Vê tenekeya helawê dayne kulînê û bila zar jê nexwin, heta ku Remezan hat." Lewre ji mêrikê xerîb **dipirse:**

-Birako navê we çi bû?

**Mêrik dibêje:**

Navê min Remezan e.

## Şahî diyarî Şehîdên Amaraye kirin

YDG-M'a İzmîrê 'Şahiyên Alternatîf ên Biharê' yên li Zanîngeha Egeyê (EU) û Zanîngeha Dokuz Eylulê (DEU) pêk tîne, diyarî Mahsum Karaoglan ku di 'Meşa Amarayê' de hate kuştin, kir.

'Şahiyên Alternatîf ên Biharê' ku ji hêla Meclîsa Welatiyên Azad û Demokratîk (YDG-M) ve li Zanîngeha Egeyê (EU) û Zanîngeha Dokuz Eylulê pêk tên, îsal diyarî Mahsum Karaoglu ku di 'Meşa Amarayê' de hate kuştin, kirin. Çalakiyên îsal dê li ber Fakulteya Wêjeyê ya EU'yê û Fakulteya Perwerdehiyê ya DEU'yê pêk bên. Şahiya muzîkê, pêşandana şanoyê, govend, guhdariya helbestan û gelek çalakiyên din dihundirîne, dê 3 rojan berdewam bike.

Her wiha di şahiyan de dê pêşangeha wêneyan a bi navê, "Zarokên Kurd ên Rastî Qontaxan Tên" bê vekirin. Endamê YDG-M'ê Bariş Okutucu diyar kir ku xebatên şahiyan hatine dawiyê û wiha axivî: "Em bang li hemû derdorên welatparêz û demokratîk dikin ku beşdarî şahiyan bibin. Şahiyên me îsal dê berfirehtir bin. Ji ber pêvajo û rewşa ciwanan çalakiyên me dê watedartir bin. Li hemberî terorîzekirina hêzên ciwanan em ê xebatên xwe bilindtir bikin."

Endamê YDG-M'a İzmîrê Ugu Tarhan ku yek ji amadekarên Şahiya Biharê ya Alternatîf e, diyar kir ku şahiyên ji aliyê zanîngehê ve tên lidarxistin bi armanca ciwanan ji polîtîkayê dûr bixin tên pêkanîn û wiha dom kir: "Bi vê şahiya altarnatîf em dixwazin bi ciwanan re bi taybetî ji ciwanên kurd re ji bo çareseriya pirsgirêka kurd bihîstiyariyê bi pêş bixin." Tarhan ku bal kişand ser operasona li dijî DTP'ê bi lêv kir ku di encama vê operasyonê de gelek rêveberên DTP'ê hatine girtin û wiha pê de çû: "Li hemberî rêveberên partiya me û bi taybetî jî li dijî ciwanan piştî hillbijartina herêmî ya 29'ê adarê pêkutî bi pêş ketin. Divê ciwan li dijî vê yekê bêdeng nemînin. Di demeke ku pirsgirêka kurd tê nîqaşkirin de ji bo piştgiriya çareseriyê çi ji destê me bê em ê pêk bînin."

Bernameya Şahiya Biharê ya Alternatîf ku wê di 20'ê gulanê de dest pê bike û 3 rojan dom bike wiha ye:

**20'ê gulanê Çarşem:**
*Koma Kendal (Ekîba Folklor nîşandana govenda gelêrî) *Koma Diyar (muzîk) *Turan Şengul (Konser)
**Cih: Fakulteya Perwerdehiyê ya 9 Eylul, saet:** 15.30)

**21'ê gulanê Pêncşem:**
*Koma Zozan (Şeyhmus) *Şahiya Hêvî (Şano) *Sînevîzyon (Nîşandana Film) *Koma Agirê Zerdeşt
**Cih: Ber Fakulteya Wêjeyê ya Zanîngeha Egeyê, saet:**17.00)

**22'yê gulanê În:**
*Koma Diyar *Panel (Dîrok û zimanê kurdî) *Koma Xelîkan *Koma Azad
**Cih:** Ber Fakulteya Wêjeyê ya Zanîngeha Egeyê, saet 17.00 **İZMÎR**




# Li Sûriyeyê nîjadperestî

## Berpirsiyarê perwerdehiyê yê bajarê Hesîçaya başûrê rojavayê Kurdistanê giştîname ji mamosteyan re şand û di giştînameyê de hat xwestin ku zimanê erebî bê parastin û 'qirêjiya' zimanên din negihîje erebî

**DELÎL FIRAT** HESICA / ANF

Belgeya ku ji aliyê rayedarên Koma Civakên Kurdistanê ve hat bi destxistin bi îmzeya perpirsiyarê perwerdehiyê yê Hesîçayê Munir Beşîr Ebdil El Hatiye ye. Di giştînameya ku ji mamosteyan re hatiye şandin de tê gotin bila erebî bê parastin û 'qirêjiya' zimanên din negihîje erebî. Di giştînameyê de ji bo zimanê kurdî peyva 'qirêj' tê bikaranîn û li hemberî kurdî êrişeke nijadî û kirêt hatiye kirin. Êrîşa berpirsyarekî perwerdehiyê ku divê zimanan wekî dewlemendiyekî bibîne asta polîtîkaya bişaftinê ya li hemberî kurdî radixe ber çavan.

**3 kurd ji dibistanan hatin avêtin**

Li Sûriyeyê ji bilî zimanê erebî zimanên din qedexe ne û bi sed hezaran kurdên li vir dijîn bê nasname ne û mamoste û xwendekarên kurd di bin zextên rejîma Sûriyeyê de dijîn.

Li gorî agahiya ku ji Komeleya Mafên Mirovan MAD'ê hatiye bidestxistin der barê xwendekarên kurd ku di Mehkemeya Leşkerî ya Halebê de tên darizandin de Zanîngeha Halebê biryareke skandal girtiye. MAD'ê diyar kir ku der barê 3 xwendekarên kurd de biryar hatiye girgit û ji dibistanê hatine avêtin. Xwendekarên ku hatine avêtin ev in; xwendekarê beşa Aborî Alan Huseynî, ji beşa Çandê Kawa Dîrokî û ji beşa perwerdehiyê Ebde Reme.

Her sê xwendekar di dema salvegera bîranîna qetlîama 12'ê Adarê de hatibûn binçavkirin. Di 12'ê Adara 2004'an de hêzen ewlehiyê yên dewleta Sûriyeyê êrîşî çalakiya Qamişloyê kiribû û 40 kes hatibûn qetilkirin. Her wiha nêzî 2 hezar kes jî hatibûn binçavkirin.

Di her qada jiyanê de kurd rastî zext, cudahî û înkarê tên û li hemberî kurdan ev polîtîka tên meşandin. Bi hewldanên Tirkiyeyê ve herî dawî li cihên ku tirk lê dijîn dibistanên tirkî hatibûn vekirin û di van dibistanan de perwerdehiya tirkî tê dayîn. Li gorî agahiyên nefermî li Helebê nêzî 50 hezar tirkmen dijîn. Her wiha balkêş e ku kurdên li vir dijîn hê jî xwedî nasname nîn in lê di asta Wezaretiyê de tirk tên peywirdarkirin. Mînak kesê bi navê Hesen ji bo Wezaretiya Parastina Hewayê û ji bo Wezareta Çandê jî tirkmenek hat wezîfedarkirin.

Ev êrîşên li hemberî kurdan piştî talîmata 3'ê Mijdara 2008'an zêdetir bûn. Talîmata veşartî ku ji aliyê rayedarên rejîma Baasê ku ji rayedarên Hesekiyê re hatibû şandin di nîsana 2009'an de derket holê. Di talîmatê de tê gotin kurdên ku dixwazin ji zagonan fêdeyê bigirin bila bên astengkirin. Her wiha di talîmatê de tê gotin bila zagon li hemberî kurdan bên bikaranîn û ev yek bila bê veşartin. Dîsa di talîmatê de tê gotin bila di dikanan de bi boneya fîrotinê dîmen û wêneyên lehengên kurdan yên partiyên siyasî û leşkerî bên qedexekirin.



*Kurd li Sûriyeyê nikarên mafên xwe yên herî xwezayî bi kar bînin û bi kirinên nijadperest ên rejîma dewleta Sûriyeyê re rû bi rû dimînin. Di vê belgeyê de tê xwestin ku erebî li hemberî 'zimanên qirêj' ango zimanê kurdî bê parastin!*

# 'Asîmîlasyona li ser kurdan didome'

KURDÎ DER bi boneya Cejna Zimanê Kurdî li Şanogeha Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê panela, "Zimanê Kurdî" pêk anî.

Rêvebera KURDÎ DER'ê Semra Ozbey diyar kir ku gelê kurd di demên dawî de polîtîkayên asîmîlasyonê ferq kirine û wiha axivî: "Di 2 salên dawiyê de bi çalakiyên cur bi cur gel xwedî li zimanê xwe derketiye." Mamosteyê zimanê kurdî Suleyman Yilmaz jî diyar kir ku gelê kurd li Tirkiyeyê bêstatû maye û wiha got: "Di Kongreya Erziromê ya 1919'an de biryar hate girtin ku tu mafên kurdan nîn in. Lê xespkirina mafên neteweyekê bi hêsanî pêk nayê. Di encama têkoşîna gelê kurd de niha pirsa, 'Em çawa pirsgirêka kurd çareser bikin?' jî xwe dikin. Gelê kurd êdî hefteyekê seatek du seat perwerdehiyê naxwaze. Gelê kurd hîndekarî û perwerdehiya kurdî ya azad dixwaze. Dewletê bi mal û dezgehên di1925'an de ava kirin heta niha polîtîkaya asîmîlasyona kurdan dimeşîne. Lê êdî gelê kurd bi têkoşîna xwe ev polîtîka vala derxistine."

**'Kurdî bi asîmîlasyonê re rû bi rû ye'**

Nivîskar-Zimanzan Amed Tîgrîs, diyar kir ku kurdî wekî zimanê perwerdehiyê nayê bikaranîn û destnîşan kir ku zimanê kurdî bi asîmîlasyoneke mezin re rû bi rû ye. Li Şaxa Kurdî Derê ya Navçeya Farqîna Amedê derbarê zimanê kurdî de panel hate dayîn. Di panela ku nivîskar-zimanzan Amed Tîgrîs û nivîskar Dilawer Zeraq wekî axaftvan beşdar bûn de, Serokê Rêxistina DTP'ê ya Navçeyê Eşref Mamedoglu, Serokê Kurdî Derê Şefîk Fidanci û gelek welatî amade bûn. Amed Tîgrîs, bal kişand ku ev 10 hezar sal in kurd li ser vê axê dijîn û wiha got: "Mirina zimanekî mirina mirovahiyê ye. Dema em zimanê xwe winda bikin em dê çanda xwa ya 10 hezar salan jî winda bikin. Îro zimanê kurdî bi asîmîlasyonek mezin re rû bi rû ye. Lewre wekî zimanê perwerdê nayê bikaranîn. Dema zimanek wekî zimanê perwerdê bê bikaranîn ne mumkune ew ziman winda bibe. Dema ziman û çanda mirov dewlemend me siyaseta ku mirov bimeşîne jî dê dewlemend be."

Nivîskar Dilawer Zeraq jî, bibîr xist ku zimanê xwe ji kesên din dixwazin û wiha got: "Lazim e bi xwendin û nivîsandina zimanê xwe berî her tiştî em xwedî li xwe derkevin. Ka em li xwe bêze bikin bê kêmasiyên me çi ne? Kengî em ji zimanê xwe hez bikin û bi zimanê xwe biaxivin, wê demê ne mumkune zimanê kurdî paş bikeve. Di asta em gihîştinê de zimanê kurdî di zinanê nivîsê de pêşketinek çêkiriye." **AMED**




## Çadira Ziman rastî eleqeyek mezin tê

Çadira Ziman a bi boneya Cejna Zimanê Kurdî hatî vekirin, rastî eleqeyeke mezin tê. Li çadirê 5 hezar pirtûkên aidî 8 weşanxaneyên kurdî tên pêşandan.

Çadira Ziman a bi boneya Cejna Zimanê Kurdî li Wanê hatiye vekirin, eleqeyeke mezin dibîne. Di Çadira Ziman de 5 hezar pirtûkên aîdên 8 weşanxaneyên kurdan tên pêşendan. Panqarta, "Bila zimanê kurdî bibe zimanê fermî" hate daliqandin û dowizên, "Çand û huner bi kurdî xweş e", "Ziman şîrê dayika mine", "Kurdî nasnameya min e" hatin vekirin. Di çadirê de, nivîskarê kurdî Omer Dilsoz pirtûka xwe ya bi navê 'Neynika Dilî' îmze dike. Her wiha pirtûk rastî eleqeyek mezin tên. Her wiha di çadirê de hunermend Mehmet Atli jî, bi stranên xwe yên kurdî piştgiriyê da pêşengeha kurdî.

**Heta 22'yê gulanî vekiriye**

Serokê Şaxa KURDÎ DER'ê ya Wanê Levent Urun, diyar kir ku wê çadira ziman heta 22'yê gulanê vekirî bimîne. Urun, da zanîn ku çadir ji hêla gel ve eleqeyek mezin dibîne, lê mixabin ji ber zimanê kurdî di dibistanan de nayê hînkirin, di hêla xwendinê de lewaz e. Urun, wiha got: "Bi taybetî yên tên çadirê piranî eleqeyê didin pirtûkên Ehmedê Xanî û pirtûkên dîrokî. Dîsa pirtûka 'Hinker' ku ji hêla Enstituya Kurdî ya Stenbolê ve hatiye derxistin, rastî eleqeyek mezin tê." **WAN**

# Li Êlihê danasîna kutilk û ecinê hate kirin

Şaxa KURDÎ DER'ê ya Êlihê, di çarçoveya pîrozbahiyên Cejna Zimanê Kurdî de xwarinên herêmî dan nasandin.

Şaxa KURDÎ DER'ê ya Êlihê, di çarçoveya pîrozbahiyên Cejna Zimanê Kurdî de li Bexçeyê Çayê yê Şaredariya Êlihê xwarinên kurdî dan nasandin. Li ser maseyên li Baxçeyê Çayê xwarinên aîdî kurdan hatin pêşkêşkirin. Xwarinên wekî Dolme, kutilk, ecîn (çîgkofte), birinc û gelek cureyên xwarinê yên mîna tirşikê hatin amadekirin û nasandin. Şaredarê DTP'ê yê Êlihê Nejdet Atalay, Serokê Rêxistina DTP'ê ya Êlihê Ozcan Erdem, Serokê Şaxa Genel-Îş'ê ya Êlihê Halîs Yakut, Serokê Şaxa SES'ê ya Êlihê Deniz Topkan, endamên DOKH'ê jî di nav de gelek kes beşdarî danasîna xwarinên herêmî bûn.

Piştî danasanînê, xwarin li beşdaran hatin belavkirin. **ÊLIH**



www.arsivakurdi.org

# Pêşbirkê gilî kirin

## Rêxistinên jinan ên li Îzmîrê li dijî pêşbirka 'Zaroka herî xweşîk hildibjêrin' a ku ji aliyê rojnameya herêmî Bayrakli ve hate organîzekirin rerazîbûn nîşan da û jinan giliya rojnameyê kir

Ligel nerazîbûnên saziyên sivîl dîsa rojnameya Bayrakli pêşbirka 'Zaroka herî xweşîk hildibjêrin' pêk anî. Rêxistinên jinan diyar kir ku pêşbirkên bi vî rengî zarokan îstîsmar dikin û der barê rojnameyê de gilî kirin.

Sazî û rêxistinên jinan li ber avahiya edliyeyê civiyan û bi daxuyaniyekê li dijî îstîsmarkirina zarokan derketin. Li ser navê jinan, endama Baskê Jinan a TKP'a Îzmîrê Ozlem Gulden daxuyanî da. Gulden di daxuyaniyê de diyar kir ku li hemberî îstîsmarkirina zarokan û kedxwariya zarokan, qanûn û ceza hene. Gulder, bal kişand ser pêşbirka ku ji hêla rojnameya Bayrakli ve hat organîzekirin û got: "Rojname bi kîjan armancê pêşbirk organîze kir û dê xizmeteke çawa bike? Divê bersiva van pirsan bê dayîn." Gulder, da zanîn divê baş bê nirxandin ka teşhîrkirina bedena zarokan, nîşandana wekî objeya cinsî, îstîsmar û kedxwariya zarokan dê li ser beden û gihîştandina zarokan bandoreke çawa bihêle .

Gulder, daxuyand ku li dijî serkeftina zarokan, dewlemendiyeke bi wî şeklê di nava civakê de zîhniyeteke wisa bi pêş dixe. Gulder, destnîşan kir pêşbirkên bi vî rengî li ser kesayetiya zarokan bandorên nebaş dikin. Jinan piştî daxuyaniyê serî li dozgeriyê da û giliyê Numan Çelîk kir. **ÎZMÎR**



# 33 welatan lêkolîn

Li ser 33 welatên Ewropayê lêkolînek hate kirin. Li gorî lêkolînê jinên ku ji tecawizê re rû bi rû dimînin gilî nakin. Herî zêde li Macaristanê jin gilî nakin. Li Macaristanê di navbera salên 2001 û 2007'an de ji sedî 2.1 jin bi sedema tecawizê gilî kiriye. Piştî Macaristanê Swêd di rêzedeye. Li Swêdê di nava sed hezar jinan de tenê ji sedî 45 jin gilî kiriye.

Li gorî pisporan ev nayê wateyê ku ewlehiya jinan li wê welatê başe. Ji ber ku gelek jin ji hêla qanûnan ve baş nayê parastin, dema ji tecawizê re rû bi rû dimîne rayedarên fermî û polîsan agahdar nakin. Her wiha li gorî îstatîstîkan li Macaristanê bûyerên tecawizê nayê îspat kirin. Dîsa şîdeta di nav malê jî ji ber pêvajoya dadgehê her diçê aloz dibe.

Ji bo lêkolînê li ser 100 mînakên taybet hatiye sekinandin. Li gorî lêkolînê nîva bûyerên tecawizê li malê, 3'yan yek li kargeh û dibistanê û ji sedî 24 ji cihên ku gel re vekirî pêk tê. Di nav 100 bûyeran de tenê 39 bûyer întîqalê dadgehê bûye. Di nav 39 bûyeran de tenê 22 bûyer bi cezaya girtinê encam bûye. Hiqûqnasan, diyar kir ku ev tişt ji ber qelsiya pergala hiqûqa Macaristanê pêk tê. **BRÛKSEL**

# Jina kete tenûrê jiyana xwe ji dest da

Li gorî agahiyan li kuçeya Sumbul a taxa Yali ya Wanê jina bi navê Hatîce Pitir (60) ji bo nan patinê tenûr vê xist. Hate zanîn ku dema Pitir xwestiye qoşxaneyê danê ser agir dengeya xwe winda kiriye û ketiye nav agir. Hate ragihandin ku heta izmên wê gihiştinê û Pitir ji tenûrê derxistine jiyana xwe ji dest daye. Cenazeyê Pitir ji bo otopsiyê rakirin Nexweşxaneya Lêkolîn û Perwerdehiyê ya Wanê. **WAN**

# Kes qîrîna jinan nabihîze

Li gorî yasaya Afganistanê tecawiza hevjînê mêr wek tiştekî normal dihat qebûlkirin. Li gorî yasayê mêr bê destûra jinê dikare bi wê re têkiliya cinsî deyne û jin ji bilî xetera mirinê, bê destûra mêrê xwe nikare ji malê derkeve. Jinên xwepîşender vê yasayê wek 'yasaya koletiyê' bi nav dikin û li dijî wê derdikevin. Serok Hamîd Karzaî jî yasayê îmze kir. Lêbelê ji ber rexneyên saziyên navnetewî heta niha yasa nehatiye pêkanîn.

Vê bûyerê careke din rewşa jinên Afganistanê anî rojevê. Li Afganistanê zextên li ser jinan didomin. Hikûmet bê ku li dijî çewisandina jinan tedbîran wergire amadekarî dike ku Wezareta Fazîletê ku di dema rejîma Talîban de hatibû damezirandin careke din veke. Jinên Afgan jî zextên li ser xwe bi şewitandina xwe protesto dikin.

Li aliyê din rewşa mafên jinan ji niha ve bê ku Wezareta Fazîletê heye jî gelek xembar e. Li başûrê Afganistanê li bajarê Kandaharê ku wekî keleha Talîbanê tê naskirin. Her çend ku rejîma Talîban 4 sal û nîv berê hat rûxandin jî ev bajarê ku zêdetir Peştû lê dijîn hîn jî gelek kevneperest e. Leşkerên hêza navnetewî derbasî vî bajarî nabin û kêm caran şandeyên rêxistinên sivîl riya xwe bi vî aliyê Afganistanê ve dixin.

Zêdebûna şîdeta siyasî pirsgirêkeke esasî ya civaka afgan piştguh dike. Ev jî zextên li ser jin û keçên afgan e. Ev zext ew çend tund bûye ku bi taybetî li Kandaharê gelek keç û jin xwe dişewitînin. Lêdan, kuştin, zewaca bi zorê, bazirganiya keçan, kuştinên şerefe, ji bo aştiya navbera eşîran bertîldana keçan çend ji cureyên zextên li ser jinên afgan in. Bi taybetî li başûr, jinên Afganistanê ligel şerîetê, yasayên eşaîrî yên kevneparêz jî hemû mafên jinan ji destê wan distîne.

Ji bilî leşkerên taybet yên amerîkî ku li pey rêça Usama Bin Ladin digerin, kes lingên xwe navêje vê heremê. Ji Brukselê heta New Yorkê dîplomatên ku behsa mafê jinan dikin jî nayên serdana Kandaharê. Ne hikûmeta Kabulê ne jî civaka navnetewî dexlê karê eşîran nabin.

Licne ya Serbuxwe ya Mafê Mirov li Afxanîstan'ê yek ji saziyên vêrek yê vî welatî ye ku di derbarê vê mijarê de jî dixebite. Wekîla Serokê Lijne ya Serbixwe ya Mafê Mirov ya Kandaharê Afîfe Marûf dema bahsa êşên jinan dike gelek xemgîn dibe. Ew dibêje her hefte gelek jinên şewitî tên Nexweşxana Mirwais ya bajêr. Li gorî Afîfe ji ber mesela namûsê û toreyan endamên malbatê jî ji ber fediyan behsa vê zilmê nakin. Li gor wê jinên ku hewldana kuştina xwe didin zêdetir yên ku bi zorê tên zewicandin in. Li gor wê bûyerên ku digîjin wan ji rastiya rewşa jinan tenê beşeke biçûk e.



### Guherîna demek dirêj dixwaze

Parêzvana mafê mirovan Afîfe Marûf hevîdar nîne ku ev rewş di demekî nêz de biguhere. Yekta riya guherîna civakê perwerde û pêşxistina rewşenbiriyê ye. Saziya wan ji bo vê armancê komên xebatê damezirandiye û semîneran dide. Bi vî awayî dixwazin balê bikişînin ser pirsgirêkên jinan. Di dema Talîban de xebata jinan jî qedexe bûye. Lê piştî ruxana rejimê jinên bajarî yên perwerdeditî dikarin herin zanîngehê an jî bixebitin. Lê rewş li gundan û li heremên eşîran berewajiyê vê yekê ye. Li gorî daneyên rêxirawên mafê mirovan bi taybetî li heremên Peştuyan pirsgirêkên giran hene. Li van saziyan salane bi sedan jin ji ber zext û çewisandinan dawî li jiyana xwe tinin. Li gor dozger û parazvana mafê jinan Maria Bashir jinên ku xwekuştin zêdetir yên ku mafên xwe dinasin in û ew bi mabesta protestokirina bira, bav an jî mêrên xwe xwe dikujin. Li gorî Maria şîddet û cudakariyên ser wan madê jinan lihev dide û ew jî bi riya xwekuştinê helwesta xwe nîşandidin.

Her wiha li Afgnîstanê ji bo ku zarokên keç neçin dibistanê jehr didin zarokan. **KABÛL**

Nîlgûn ŞAHÎN

## Ev komkujî berhemê zîhniyeta dewletê ye

Mêrdîn: bajarê herî kevnare yê bakurê Kurdistanê ye. Bi bazirganî, çandinî û xwedîkirina lawira ve bi taybet tê naskirin. Li ser her avahiyekê, kevirekî û deverekî wê rûpelek dîroka qedîm hatiye nivîsandin û nexşandin.

Bi taybet di aliyê çand û rengdewlemendiya civakî de Mêrdîn bajarekî mozaîka gelay e. Her ziman, zarava, reng, deng, ol û mirov tê de cih girti ye. Her çiqas behsa ol û çandên din were kirin jî, ew dayin û standina ji nêzve ew gelê wir hîn zêde nêzî hevdû kirin e. Bûne dost û heval, bûne mirovên hev, bi taybet jî bûne xal û xwarzî ... Her kar û pirsgirêkê xwe bi xwe bi heman ferasetê û rêveberiyê derbas dikirin. Ev carna li gorî demê bûne eşîr, carna bûne bavik bi her awahî li gorî dewlemendiya civakê ev mozayika xwe dame diyarkirin. Her wiha her tim li gorî berjewendiyê civaka xwe ya giştî tevgeriya ne. Li ser hîmê parastinê û têrkirina civaka xwe bi taybet hêmana eşîrî ji bo xwe bingeh girtin e.

Tê zanîn ev 35-40 salê bi tevgera rizgariya neteweyî ya gelê kurd bi her awahî li ser van kirinên dewletî û vê zihniyeta qetliyamê qebûlnekirinê. Bedelên herî giran dan. Li ser esasên nirxên gel ev bedelên ku hatine dayîn bi hezaran caran bi bîranîn. Jin di her alî de rûniştina li mala xwe û kar û barê xwe danî aliyekî hemû hêza xwe ketin seferberiya vê pêvajoyê û di her alî pêşengiya demê kirin. Li dijî neheqiya dengê xwe heta dawî bilind kir û got ÊDÎ BESE, BESE, BESE ...

Bi sala ne li herêmê bi taybet li Mêrdîn, Şirnex, Qilabanê ... pergala xwe an jî bi navekî din bêpergaliya xwe bi navê parastinê CERDEWANÎYÊ dide avakirin. Ji xwe pêwîst nîne nav bi guhere zihniyeta dewletî bixwe ji karê cerdewanî gelek zêdeti re. Ew li ber deriyê xwe girêdan û kedî kirin, mihtacî her tiştî kirin. Dema ku tengav dibe wekî dûpişkê bi xwe ve did e. Di encama amadekariya dewleta korfam de îro 70 hezar cerdewan hatiye amadekirin. Yanî 70 hezar çek. Lê îro em dizanin ev yek vê mêjiya parsek ya bi qirêj têr nake. Di dawetekê de li ser li mêjê berê van çekan didin 44 mirovên xwe. Dê, bav, bira, xwîşk, xaltî, metê xwe ... Her tişt li holêye. Di bin navê erd, pere, bûk û zave de bi plansaziya herî bi sosret erkdarên dewletê û kûçikên ber deriyê wê cerdevanên wê, bi vê wahşeta xwe xwestin pêvajoya aştiyê ji holê rakin. Vê bûyerê bi navê PKK'ê bidin diyarkirin. Her wiha eve ji bo dewleta çavsor dibe êrîşa destûra leşkerî. Êrîşa siyasî hîn didome. Bi girtinên endam û rêvebirên DTP'ê ev yek ji bo xwe xistiye meriyetê. Encama şûştina mejiyê mirova îro cerdevanî derketiye.

Di aliyê çanda ol, eşîrî, yekbûna civakî de dijminahiya herî mezin derdike ve ku îro di malbatekê de ji hevdû re dibin neyar û 40 kesî dikujin. Di aliyê mirovahî de bê ehlaqî û bê wîjdaniya herî mezin e. Ku îro em mirov dawiya hebûna xwe tînin. Belê komara Tirkiyê tê çawa deyn û hesabên van kirinên xwe bide? Tê çawa vê rûreşiya xwe ji holê rakî?

Bi rastî jî heta ku kevirekî li orta serê vê komarê nekeve şiyar nab e. Piştî xwîna 44 mirovan li erdê herikî hindek civaknas sonda xwe ya ne axaftinê xerakirin. Dibêjin mirovên vir ne normalin. Berpirsiyarên ku îro nizanin çi di axifin dibêjin em vê bûyerê fêm nakin. Em nikarin vê bûyerê şîrove bikin. Rastiya ku îro dewlet di encama cerdevaniyê de gihaştiyê ew bi xwe jî fêmnakin. Nikarin îzah bikin. Çekên ku danê destên nezan û neçara ê rojekê li wan biftile. Lê cardin cihê 44 mirovên Zanqirtê nagire.

# Bi hinceta namûsê hate kuştin

Cenazeya Dilnas Xidira 25 salî du meh in li Peymangeha Bijzîşkiya Dadweriyê ye. Dilnas ji hêla xizmên xwe ve bi sedema 'namûsê' hatibû kuştin. Kesûkarên wê ji bo veşartinê jî cenaze nagirt. Dilnasa dayika 3 zarokan li nêzî Bajarê Koyê ji alî xizmên xwe ve bi 17 guleyan hatibû kuştin. Cenazeyê wê niha di firîzera peymangehê de dimîne. Li Kurdistanê jinên ku dibin qurbanên cinayetên 'namûsê', hêjayî goristanê jî nayên dîtin. Cesed an li cihê tên kuştin an jî li nexweşxaneyan bê xwedî dimînin.

Berpirsa Liqa Hewlêrê Yekîtiya Jinên Kurdistanê Sozan Feqê, dûvçûnê li vê bûyerê kiriye û bi Wezîrê Karûbarên Jinan re rûniştine û pêşniyar kiriye ku cesedên bêxwedî yên jinan bi merasîman bên veşartin: "Niha jî em çaverêyê kar û bersiva Wezîrê Heremê dikin. Eger nebe em ê hewl bidin bi hemû rêxistinan re li ser hikûmetê bandor bikin."

Sozan Feqê, neveşartina cesedan wek karêkî li dijî mirovahiyê bi nav dike: "Tiştekî ne mirovanî ye ku sivikatî bi termên wan tê kirin. Pêwîst e ji bilî tawana kuştina wan, malbatên wan li ser tawana neveşartina wan jî bên darizandin." **HEWLÊR (Rudaw)**

*Sersaxî*

*Endamê me yê hêja û welatparêz,*
*evîndarê zimanê kurdî* ***KADRÎ GOKDERE***
*çûye ser dilovaniya xwe*
*Em ji malbata wî re sersaxiyê dixwazin*

**KURDÎ DER**

www.arsivakurdi.org

Hawar
19 Gulan 2009 Şeşem

## Lîmoneke taybet

Li hin welatên Asyayê lîmoneke taybet şîn dibe. Navê vê lîmona taybet "Destê Buda" ye. Pispor dibêjin ku ev lîmon di warê asîtê de pir dewlemend e. Rengê wê zer e û dendikên wê jî nîn in. Di devê mirovan de tehmeke zuwa dihêle. Li cihên ku şîn dibe ji aliyê gel ve eleqeyeke mezin dibîne. **PEKÎN**









# Demsala çêkirina tenûran hat

**I EMÎNE DEMÎR** AMED

Li Kurdistanê çêkirina tenûran çandek e. Dayika bi navê Beyaz Oral jî bi nêzîkbûna havînê re dest bi çêkirina tenûran kir. Dayika Beyaz bi vî rengî debara malbata xwe dike

Li Amedê dayika bi navê Beyaz Oral ji bo debara xwe bike tenûran çêdike û bi firotina tenûran ve zarokên xwe dide xwendin. Beyaz Oral ji gundê Îzmilkê ya bi ser navçeya Pîranê koç kiriye û hatiye Amedê. Oral li vir ligel zor û zehmetiyan têkoşîna jiyanê dide.

Beyaz Oral û malbata xwe ji ber pirsgirêkên aborî ji gundê Îzmilkê ya bi ser navçeya Pîranê koç kiriye niha jî li taxa Seyrantepeyê dijî. Oral li vir tenûran çêdike. Beyaz Oral 40 salî ye û 15 zarokên wê henê. Hevserê Oral jî emeletiyê dike. Oral diyar kir ku ji bo zarokên xwe xwedî bike 5 sal in tenûran çêdike û di karê xwe de jî gelekî serkeftî ye lê ji ber ku tenûr erzan tên firotin gelek zahmetiyan dikişîne.

Piştî zivistanê ji bo tenûr bên nûkirin dayika Beyaz dest bi çêkirina tenûran dike. Tenûrên ji heriya sor tên çêkirin her wiha havînê ji nû ve tên avakirin ji ber ku zivistanê tenûr ji ber baran û berfê xira dibin û êdî nanên li tenûrê tên pehtin bi tenûrê ve dizeliqin. Her wiha kevir û heriya tenûrê bi nan ve dizeliqe ji ber vê yekê bi nêzîkbûna havinê bi heriya sor tenûrên nû tên çêkirin.

Dayika Beyaz dibêje ku tenûr çandeke kurdewariyê ye û li hemû deverên Kurdistanê têne bikaranîn. Dayika Beyaz der barê vê yekê de wiha got: "Tenûr çanda me kurdan e û em ji dê û bavê xwe hîn bûn û li hemû derên Kurdistanê jî tenûr tê çêkirin lê bi şêwazên cuda tên lêkirin."

### Çawa tên çêkirin?

Dayika Beyaz der barê çêkirina tenûran de wiha got: "Tenûrên ku nan lê tê patin ji axa sor tên çêkirin. Tevlî axa sor ka, xwê û mûyê bizinan jî tê bikaranîn ku tenûr zû bi zû neşeqite. Heriya ku tê çêkirin qor bi qor tê lêkirin pişti lêkirina tenûrê hefteyekê jî li ber tava rojê tê ziwakirin. Tenûra nan bi giştî li ser axê ye, mîtroyekê ji erdê bilind e. Firehiya wê jî mîtroyek e. Lê ji erdê ber bi hundirê tenûrê ve firehî biçûktir dibe. Devê tenûrê nîv mîtro ye û tenûr bi pêjink û darên hişk tê germkirin." Her wiha di çêkirina tenûran de gelek zahmetî jî tê kişandin. Divê ji bo tenûr bê çêkirin motora heriyê bê girtin, motora heriyê di her carekê de ji bo 20 tenûran herî çêdike û her carê ji bo çêkirina heriyê 135 TL werdigire. Xwêya ji bo 20 tenûran jî 10 TL ye. Buhayê hin tenûran jî li gorî mezinbûn û başbûna wan diguhere.. Buhayê tenûran di navbera 30 û 40 TL'yî de ye.

Pişti ku tenûr hate firotin jî dayika Beyaz van pêşniyaran li muşteriyên xwe dike: "Gava ku hûn ê tenûra xwe bi cih bikin pala wê bidin dîwarekê û bi tûxleyan jî dora wê zexm bikin. Piştî vê yekê divê hûn van tûxleyan jî bi heriyê lêkin ji bo ku tenûra we zû bi zû xira nebe."



# Li çiyayê Tanînê seyran

Parlamenter û şaredarên DTP'ê jî di nav de, bi hezaran kes beşdarî şahiya Şaredariya Qilabanê ya li dahmenên çiyayê Tanînê pêk anî, bûn. Parlamentera DTP'ê ya Şirnexê Sevahîr Bayindir diyar kir ku divê çiya ji bo geşt û şahiyan ji gel re bên vekirin.

Şaredariya Qilabanê li dahmenên çiyayê Tanînê li ser Ava Spî şahiyek li dar xist. Parlamenter Sevahîr Bayindir, Şaredara Qilabanê Şukran Sîncar, Serokê DTP'a Şirnexê Halîl Îrmez, Şaredarê Şirnexê yê berê Ahmet Ertak, Şaredarê Hezexê Resul Sadak, Şaredarê Gundikê Melê Abdurrezak Yildiz, Şaredarê Dêrgulê Abîdîn Durak û bi hezaran kes beşdarî şahiyê bûn. Şahiya ji Şirnex, Silopî, Hezex û Cizîrê jî gelek kes beşdar bûn wekî mîhrîcanekê derbas bû. Welatiyan li ber dahol û zirneyê govend girêda û bi newaya tenbûrê re jî stran gotin. Parlamenter Bayindir û Şaredar Sîncar li nav welatiyan geriyan û sohbet kirin. Girseya ku meş li dar xist, govend girêda û stran got li dahmenên Çiyayê Tanînê dîmenên rengîn derxistin holê.

### Geşt dê bibe mîhrîcan

Şaredara Qilabanê Şukran Sîncar diyar kir ku piştî hilbijartinê daxwaza mîhrîcanekê hebûye û wiha axivî: "Me îsal destpêkek kir. Li Qilabanê yekem car e tiştekî wiha tê kirin. Armanca me ew e ku em hestên yekîtiyê di nav gelê Qilabanê de bi hêztir bikin. Xebatên me yên wiha dê berdewam bikin. Em dixwazin vê geştê vegerînin mîhrîcanekê." Parlamenter Bayindir jî diyar kir ku ji gelê xwe re gotine dê bihara 2009'an bihareke xweşiktir be û ev tişt gotin: "Axa Kurdistanê bi kesk, sor û zeran xemiliye. Gelê me jî bi dengê xwe her der xemiland. Careke din Cejna Zimanê Kurdî tê pîrozkirin. Gelê me jî bi organîzasyona şaredariya xwe derketiye geştekê. Em dixwazin ev çiyayên me yên bedew ji bo geşt û gera gel bên vekirin. Em ê bi hev re çareseriya pirsgirêka kurd bînin. Îradeya gelê kurd a di 29'ê Adarê de derketiye holê ji hêla hemû cîhanê ve tê axaftin. Em ê bi têkoşîna xwe zordariyan ji holê rakin û destkeftiyên xwe mayînde bikin. Em dibêjin bêyî Ocalan û PKK'ê tu çareserî çênabe." Piştî axaftinan gel sloganên, "Bijî Serok Apo" û "Bijî PKK avêtin" berz kirin. **ŞIRNEX**



Bi hezaran kes di seyranê de hatin ba hev.



# Nivîşkan hatin cem hev

Şaredariya Yenîşehîrê bi boneya, "Hefteya Nivîşkanan" welatiyên nivîşkan di geştê de anîn cem hev. Şaredarê Yenîşehîrê Selîm Kurbanoglu bi nivîşkanan re sohbet kir. Kurmanoglu diyar kir ku dixwazin zêdetir rewşa nivîşkanan raxin ber çavan û civakê hîstiyar bikin. Kurbanoglu anî ziman ku xebatên wan ên bi vî awayî dê berdewam bikin.

Welatiyên nivîşkan li ber zirneyê govend girêdan û demên xweş derbas kirin. **AMED**

# Destê xwe her tim bişon

Ji bo ku mirov xwe ji nexweşiya şewba berazan û şewbên din biparêzin divê baldar bin û guh bidin pêşniyarên pisporan.

Pispor diyar dikin ku bi taybetî dema ku mirov dikuxe divê destên xwe bi sabûnê bişo. Heke derfetên şûştinê tune bin wê demê bi alkol an jî madeyên din paqij bike. Hin pêşniyarên pisporan wiha ne: "Dema ku mirov dikuxe divê devê xwe bi desmalên yekcarî bigire û piştre jî wê destmalê bavêje. Destmalên din jî divê teqez bên şûştin. Divê mirov dstên xwe nedin çav, dev an jî bêvila xwe, ji ber ku vîrus bi vî rengî belav dibe. Heke mirov bi xwe nexweş be divê dernekeve derve û bêhna xwe vede." Pispor dibêjin heke ligel hemû tedbîran mirov serma girtibe divê hin tedbîrên din bigire û der barê tedbîrên ku bên girtin de jî wiha dibêjin: "Heke mirov serma girtibe divê kesên din agahdar bike, malbatê an jî cihê ku lê dixebite agahdar bike. Bi qasî ku ji desê mirov tê divê nekevin cihên qerebalix. Li malê bêhna xwe vedin û av û vexwerinên ji fêkiyan vexwin. Heke derbas nebe wê demê divê mirov teqez serî li bijîşk bide û li gorî pêşniyarên bijîşkan tedawî bibe. **AMED**

# Wesayîtan bi kar naynîn

Li Almanyayê navçeyeke biçûk heye. Navê vê navçeyê Vauban e. Li vê navçeyê pirsgirêka trafîkê tune ye, ji ber ku kesên ku li vê navçeyê dijîn wesayîtan bi kar naynin.

Navçeya Vaubanê li Almanyayê xwedî cihekî taybet e. Li vê navçeyê bikaranîna wesayîtan qedexe ye. Li malan garajên wan nîn in. Li navçeyê wesayîta ku tê bikaranîn bîsîklet e. Wekî din, dimeşin. Taybetiya navçeyê tenê ne ev e. Şêniyên navçeyê di warê bikaranîna enerjiyê de jî pir baldar in. Malên navçeyê ji bo ku enerjî baş bê bikaranîn li cem hev hatine çêkirin. Li Almanyayê bi giştî mal li dûrî hev tên çêkirin ev jî bi xwe re pirsgirêka germbûnê tîne. Lê li vê navçeyê tedbîr hatine girtin. Şêniyên ku li vê navçeyê dijîn dibêjin ku wan ev tedbîr ji bo zarokên xwe girtine. Ji ber ku navçeya ku wesayît lê tune ne ji bo zarokan wekî bihuşt e. Li navçeyê kesên ku bi israr bixwazin bibin xwedî wesayît, ji bo vê jî destûr tê dayîn. Lê bi şerta ku ew kes divê wesayîtên xwe li garaja şaredariyê bihêlin. Kesên ku wesayîtan dikirin, divê heta parkê bimeşin. Ev jî wesayîtê bêwate dike. Ji ber vê yekê jî kes naxwaze wesayîtan bikire. Her wiha ji bo parka Şaredariyê jî divê 40 hezar dolar bidin.

Li navçeyê 5 hezar û 500 mal ku di çarçoveya plansaziyeke baş de hatine çêkirin hene. Her kes dikare bi rehetî xwe bigihîne her derî. **BONN**

www.arsivakurdi.org